


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

TEMA: MEDRESE

PAYÎZ 2002



18

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 18, PAYÎZ 2002

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, B. Darı, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adres:

li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Salagatan 20 Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

li Almanyayê

M. Özgür

Birnebûn Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya

Telefaks: 0049-(0)2203-301630

Biha/Fiyatî:

Europa: 5 Euro * Türkiye: 2 500 000 TL.

(Bu fiyat eski dergiler içinde geçerlidir)

Abone (2 yıllık bedeli):

İşveç: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

Türkiye banka hesap numarası:

F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi

Hesap No: 00158001 445398272

İşveç hesap numarası:

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası:

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln

Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin/Dağıtım

Ankara: Garip plak ve kasetçilik

Sanayi cad. M. Koloğlu İş Merkezi, No: 7/51 Ulus/Ankara

Tel: (0312) 309 37 16 • Fax: (0312) 309 35 48

Haymana: Garip Plak ve Kasetçilik

Cumhuriyet cad. No: 21 Haymana/Ankara

Tel: (0312) 658 12 89

Polatlı: Engin Kart

Duygu Müzik Üretim Yapım Dağıtım Pazarlama

Selçuk cad. no 25/ b Polatlı-Ankara

Tel: (0312) 621 18 85 • Fax: (0312) 622 38 88


Hollanda

Neçirvan Qilorî

Tel: 0031-62 4663655


Çap/Baskı

Apec-Tryck AB



Şivanek ji gundê Arabliya

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê
re tîn, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî,
li xwedî nayên vegerandin.



Bergê pêşîn:
Medresa Oxînê,
ji arşîva Giyasettîn Emre



Nivîsên bi kurdî

Bila sala 2003 ya bibe saleka bi xêr û bereket! 2

Kongreya duyemîn a giştî ya Komela Ziman hat çêkirin 5

Şahiya 5 saliya Bîrnebûnê 7

Weşanxaneyê APEC'ê xelat belav kirin 10

Suzan Samancı hat Stockholmê 12

Xwendin û Feqîtî 15

Mele Rehîm 27

"Kurd timê bi zimanê xwe li pê mane" 30

Serpêhatiya melekî Kurdistanê û kurdên Anatoliya navîn

wek keşfa Kristof Kolombê Amerikî ye. 32

Em zarok bûn, bûne bûk! 36

Gurê har 41

Du kilamên dîrokî 43

Stranên folklorîk 48

Civata kurdî li Australya 50

Mûcîzeyê Kurdên Anatoliya Navîn 55

Wecîz (Biwêj) 58

Ferhenga Kurdî-Holendî 60



Türkçe yazılar

Paketin Getirdikleri! 67

Şeyhbizinlar Üzerine Bir Belge 72

Said-i Kürdi ve kardeşi Abdülmecid'in Konya Günleri 74

Sim ve Zer 80

Islahiye'den, Kırşehir'e Mala Xalî Reş' in Uzanan öyküsü 82

Üçleme ve R – Dil Teorisi Işığında Rışvan Aşiretleri 89

Bila sala 2003 ya bibe saleka bi xêr û bereket!

Xwendevana/ê bi rûmet, em bi hejmareka din dîsan bi hev re ne û ji we re dibên; ew rojên we yê nû mubarek û sersala we ya nû pîroz be. Bi hêviya ku sala nû ji bo hemû însaniyê bibe salek bi xêr û bereket, bê qeza û bela!

Kovara me bi vê hejmara xwe ve pênc saliya xwe tije kir. Em li vir dixwezî ji bo we bidin diyar kirin ku dema ev daxwaz û piştgiriya we; xwendevan û dostan nebûya, em îro nedigihêştin wan rojana. Ji bo vê yekê jî dibêjim; bila pênc saliya kovara Bîrnebûnê ji me giştikan re pîroz be!

Di vê demê de dîsan rewşa cografya me bi her aliyê ve bala cihanê kişandîye ser xwe. Di rojên pêşiyê de jibo însanên di vê cografyayê de dijîn dikarin hem rojên dijwar û hem jî yê ronahiyê bin. Hêvî û bawerîya me helbet ji bo rojên ronahiyê ne. Rêya ronahiyê ne dûz û ne jî hêsan e. Jê re xebat, sebir, zanistî û bawerî divê!

Me di vê hejmarê de zêde cîh daye mesela dîn. Gelo rola medresa û meletiyê di civata me kurdan de çi bû? Di van medresan de çi dihat perwerde kirin? Dîn di civatekê de çi rol lîstine? Di xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî de medrese çiqes bûne alîkar? Di têkiliya navbera kurdên Anatoliya Navîn û yê Kurdistanê de dîn çiqes cîh girtiye? Em dê hindik be jî hinek pirs û bersivan di wê hejmarê de bibînin.

Bi sernivîsa *Xwendin û feqîf* birêz Emîn Norozî cara yekem e ku li ser medreseyên kurda di kovara me de dinivîsîne. Nivîs di pir aliyên de balkêş e. Nivîskar hem bîranînên xwe û hem jî perwerdeya li medresan bi çî

awayî dibû, bi zimanekî xweş li ser karekteran melan û feqîyan jî sekinîye.

Giyasetîn Emre, parlementerê Muşê yê kevn bi sernivîsa *Kurd timê bi zimanê xwe li pê mane* ve bîranîneka xwe nivîsiye. Dîsan bi sernivîsa *Serpêhatiya melekî Kurdistanê û kurdên Anatoliya Navîn wek keşfa Kristof Kolombê Amerîkî* ye Mele Beşîr bîranîna xwe ya Anatoliyê anîye ziman.

Serpêhatiya jiyana pênc jinên kurd yê Anatoliya Navîn ku niha her pênc jî li Swêdê dimînin di wê hejmarê de bi sernivîsa *Em zarok bûn, bûne bûk!* hûn ê di hevpeyvîna Altun Başaranê de bibînin.

Mistefa Kizilkaya ji devê Fîdana Elo ji gundê Xabûra du kilamên dîrokî berhevkerîye. Kilam hem jî aliyê folklorîk û hem jî ji aliyê dîrok û ziman de jî balkêş in. Berhevkerîna folklor a bi vî awayî pir muhîm e. Herkesê ku bikaribe ji derhêla xwe ji folklor û çanda me tiştan berhevke û bişîne dakû bên parastin.

Bi hevpeyvîn û berhevkerîna; strand, çîrok, hekatan di sa ew hejmar jî, ji aliyê folklorî de hatiye dagirtin.

Di beşa tirkî de jî bi sernivîsa *Paketin Getirdikleri* Yusuf Polat li ser rojeva piştî hîlbijartina li Tirkîyê û guhartinên ku dixwazin bînin kirin sekinîye. Bi sernivîsa *Şeyh Bizinlar Üzerine Bir Belge* nivîsek lêkolînî û herwiha Rohat Alakom ji dîrokê de bi sernivîsa *Said-i Kurdi ve Kardeşî Abdülme-cid'in Konya Günleri*, lêkolînek balkêş kirîye.

Bi hêviya rojên roniyê bimînin di xêr û xweşiyê de!

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Min herdu hejmarên Bîrnebûn'ê ku we ji min re bi riya postê rêkiribûn, girtin. Ez pir kêfxweş bûm. Min piştî çend rojan pereyên abonetiya xwe ya Bîrnebûnê ji bo salekê ji we re rêkir. Em kurd kelepûra xwe ya kal û bavan ya windabûyî digerin. Herçend em hinek pašta mane jî, hin ne dereng e. Kurdên Anatoliyê serbilindiya me kurdan in. Ew, zimanê xwe yê mader (zîkmakî) dizanin, ji bîr nekirine. Ne tenê ev jî, wan çawa tê xuyan destpêkirine zimanê xwe yê şîrîn dixwînin û dinivîsîn. Ji bo

ku ew şopa koça me ya wundakir" hin jî zelatir bibe...

Ziman haceta here giringtirîn e ku mirov dikare pê berxwe bide. Qudreta hînbûn û hînkirinê bi rêya Bîrnebûnê ji xwe re dertê holê. Ne bi bedbînî, bi bînfirêhî me daye pey vê şopa ku me ew hezar sal e wundakiriye. Ez bi xwe vê şopa ziman, çand, edebiyat û zanebûnê, xelasbûna welatê me bawer im. De bila bi xêr be!

Dr. Siddik Unus

Hevalên Heja!

Îro ez dixwazim li cem we spasiya xwe pêşkeş bikim. Lewra bê arîkariya we min îro nikarbû ji hepsa Tirkîyê azad bibim. Ji bo wê alîkariya we spasên dilxweşî û delalî dikim.

Bi silavên germî û hevalî

Haci Erdoxan

Sevgili dostlar, arkadaşlar,

19.11.2002 de İstanbul Hava Limanı'nda tutuklanmamdan sonra benim serbest bırakılmamda önemli destekleri olan; başta Kürt Tutsaklarla Dayanışma Komitesi AZADİ'den Monika, Gazeteci Dr.Nikolaus Brauns, Claudia Wegner, Avukat Juliane Scher, Türkiye'nin Almanya Büyük Elçiliği, Almanya Dışişleri Bakanlığı, İtalyan Senatosu ve adını saymadığım diğer yabancı Kürt dostları olmak üzere, Bîrnebûn dergisi çalışanları, Orta Anadolu Kürt Kültür Vakfı'ndan sayın Yusuf Polat, avukat Levent Kanat, MHA'dan Cemal Uçar, Özgür Politika gazetesi, Kürdistan Ulusal Kongresi ve ismini burada saymadığım tüm dostlarıma sıcak dayanışmalarından dolayı teşekkür ediyorum.

Hepinize candan saygı ve selamlarımla.

Haci Erdoğan



Osman Alabay (Curukî)

Bavê min, Tu ji me re heval û dost bûyî. Tu kurd, helbestek, dîrokek û filosofek bûyî. Te tim û tim digot: "*Her tişt xwe nû dike. Zeman dermanê hemû tiştan e*". Erê, ev zeman zû derbas dibe. Kurd di bin destan de ne û zordestî her berdewam e...

Bavê min, tiştên baş jî çêdibin. Me *Komela Ziman* saz kir. Kovara *Bîrnebûn* 5 saliya xwe pîroz dike. Li Swêdê Vaqfa Çanda Kurdên Anatoliya Navîn ava bû. Jiyana me berdewam e. Hêviya me mezin e.

Bavê min, em tu car te jibîr nakin.
Tu yê hertim di dilê me de bijî.

Esat Kenan Alabay
Almanya Federal

Kongreya duyemîn a giştî ya Komela Ziman hat çêkirin




Dimenek ji kongrê, Wuppertal 09.11.2002

Kongreya duyemîn a giştî ya Komela Ziman û Kultura Kurdên Anatolîya Navîn li Elmanya, bi kurtî *Ziman*, di roja 09.11.2002' an da li bajarê Wuppertalê ya Elmanyayê hat çêkirin. 20 endamên komelê tevî kongrê bûn.

Piştî vekirina kongrê ji bo kesên şehîd deqîçek jibo rêzgirtinê pêkhat. Paşê beşdaran nasiya xwe dane hev. Ji weqfa Swedê jî çar hevalên me beşdar bûn. Beşdarbûna wan hevalan dilê me şa kir. Ji tespîtkirina endaman şunda rapora komîta rêvebirinê ji aliyê serokê komelê, Yusuf Polat ve hat xwendin. Serokê komelê di rapora xwe da li ser karên sala derbasbûyî

sekinî. Wî fikra avabûna komelê, mîna derketina qivonkan (mantar) û piştî wê jî derketina kovara Birnebûnê, wekî mînak da. Avakirina komelê bi daxûyaniyekê ve hat îlan kirin û endam gişt bi namekê hatin agahdar kirin. Komelê di sala derbasbûyî da ji endaman û kesên ku alîkariya komelê dikin (endamên piştgir), tev hev 32 kes, gelek pere kom kir û ji bo ku hejmara wan zêda be, gavên girîng avêtin.

Paşê jî rapora **komîteya çavdêr** hat xwendin. Gor raporê hin karên zêde hene ku, divê bên çêkirin. Yanê hejmara endaman û endamên piştgir zêde bin û her endam, endamekî nû peyda bike.



Hozan Pico
di şeva şahiyê de

Li ser raporê niqaş hat çêkirin. Fikra endaman ev bû ku, karên komelê her çiqas giran be jî, lê pêşta tere û kêmasiyên wê di demeke nezîk da divê bîn bertêrê kirin. Armanca me ya herî mezin, yanî avakirina kursên zimanê kurdî li welêt jî li ber me ye û ji bo vê yekê hin gav hatine avêtin. Hevalên me yê li welêt muracata kursan kirine. Tiştêkî din î negatîf jî ev e ku, endamên komîta rêvebirinê her yek li aliyekî Elmanyayê rûdinê.

Piştî rûspîkirina komîta rêvebirinê, li ser niqteyên destûrê, yê ku divê bîn guhertin, hat sekinandin.

Di kongrê de sê kesên din jî bûn endam û endamêtîya wan hat qebûl kirin.

Piştî hîlbijartina divanê, organên nû hatin hîlbijartin.

Di dawî de jî endam û mêvanan pêşniyarên xwe gotin. Li vir pêştabirina karên komelê pir muhîm hat hesibandin û li ser parvakirina kar û xebatan hat sekinandin. Ji van pêşniyaran hinek ev bûn:

- Peywendî bi weqfa Swedê ra,
- Bi weqfa Swedê va projeye ziman bê çêkirin.
- Vekirina kursên zimên li welêt û Ewropa.
- Peydakirina îmkanan ji bo wan kursan.
- Lêkolîn li ser Kurdên Aksaray, Kırıkkale, Çorum û aliyê din.
- Piştgirî ji bo kesên lêkolînan,
- Pêşvabirina karên komelê li Kolnê.

Mistefa Mix

Şahiya 5 saliya BÎRNEBÛNÊ

Piştî kongra Komela Ziman şevêk hat çêkirin. Ev şeva him ji bo pîrozkirina kongrê him jî zêdetir ji bo 5 saliya derketina kovara Bîrnebûnê hat çêkirin. Di şevê da stranbêjê me yê bi nav û deng, Hozan Pîço ji gundê Kelhasan, kilamên dil û evîniyê gotin. Faruk û Bayram jî bi dahol û zirnê mêvan û endam dilşa kirin. Di şevê da ji Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swedê Reşit Karakuyu axifî. Li ser 5 saliya Bîrnebûnê jî Ali Çiftçi û Nuh Ateş her yekî axaftinek çêkir. Ali Çiftçi di axaftina xwe de giranî li ser derketin û belavkirina kovarê qise kir û herwiha pêwistiya piştgîrya kovarê anî zimên. Nuh Ateş jî di axaftina xwe da li ser armancên weşandina Bîrnebûnê sekînî û got ku, di serê her tiştî zanîn heye û bê zanîn meriv rîya xwe şaş dîke. Bîrnebûn jî ji bo Kurdên Anatoliya Navîn kaniya zanînê ye. Di tarîxê da ev cara yekemîn e ku Kurdên Anatoliya Navîn li ser tarîx, edebîyat û kultura xwe bi Kurdî dinivîsin. Nuh Ateş Bîrnebûn ji bo parastina kultur û zimanê Kurdên Anatoliya Navîn, wek komunikator hesaband û got ku, meriv gerek e global bifikire û lokal bixebite.



Wî rola Bîrnebûnê di vî warî de anî zimên.

Ji bo şevê rexistinên Kurd, mîna Komkar û rojnama Dema Nû mesaj şandin û ji bo kar û barên Bîrnebûnê serfirazî xwestin.

Pênc saliya Bîrnebûnê bi xêr be, pîroz û bimbarek be!

Mistefa Mix

Protokola Civîna Vaqfa Swêd, Komela Ziman û Kovara Bîrnebûnê

Dem: 9.11.2002

Seet: 22.00

Cî: Wuppertal–Almanya


Beşdar: Li ser navê vaqfê: Reşit, Ömer û Hacı
Li ser navê Komelê: Mustafa, Yusuf, Şîxo û Kemal
Li ser navê Bîrnebûnê: Ali, Nuh, Fikret û Muzaffer

Hevalên ku beşdarî civînê bûn, li ser yek babetê sekinîn:

- Di pêşerojê da em ê kîjan kar û projeyan bi hevra bikin?

Di civîne da çend biryar hatin girtin. Hevalan dîtîn û îmkanên xwe anîn ziman. Ji bo dema pêşerojê ev peşniyarana hatin ziman:

- Projeyên ku çêbin gerek pêşta hazir bibin. Ji bo alikariya îmkanên Avrupa divê proje li du welatên Avrupa çêbin.
- Divê em dest bi seferberiya hînbûna ziman kurdî bikin.
- Ji bo ciwanan û mezinan projeyan amade bikin.
- Bi navê, "Çiqas insanê Kurdên Anatolîya Navîn li Avrupa dijîn" projeyek çêbe.
- Ji bo nasandina kar û rêxistina me gerek em bi her insanekî me ra tekîlîyê çêbikin. Li her welatên Avrupa insanên me hene.
- Li welat Projeyêke Pîlot–Taybeti: Kursa Zimanê Kurdî
- Di nav gundên me de festivalek bê amade kirin.
- Ji bo ku insanên me bînin nav kar û barê me, li welat, di havîna 2003'an li gundeki civînek divê bêt amade kirin.
- Hevalên ku di nav gruba xwe da ji bo peşerojê kar hildane ser milên xwe, divê karên xwe berdevam bikin. Di nav rêxistinên me da tekîlîyêk bi koordîne divê hebe.



Dîmenek ji dersa zimanê kurdî

Qurseke zimanê kurdî ji bo jinan

Li Stockholmê, li taxa Fittjayê qurseke zimanê kurdî ji bo jinên kurdên Anatoliya Navîn destpêkir. Qasî 10 jin fêrî xwendin û nivîsandina kurdî dibin. Mamosteyê qursê, Ekrem Altin e ku bi salan li vê taxê mamostetî ji bo zarokên kurdên Anatoliya Navîn kiriye. Ev qursa ji aliyê kovara *Bîrnebûn* û navende *Mångkulturellt centrum* de hatiye amade kirin. Çawa tê zanîn ev dora salekê ye kovara *Bîrnebûn* û *Mångkulturellt centrum* ji bo danasîna çanda kurdên Anatoliya Navîn însiyatîfek bi hev ra amade kirine. Hersal ji aliyê vê insiyatîfê de bi navê *Rojên Anatoliya Navîn şahîk* li taxa Fittjayê tê amade kirin.

Pêşengeha (sergi) çanda kurdên Anatoliyê Navîn

Kovara *Bîrnebûn* û *Mångkulturellt centrum* vê bahara tê, meha 4'an de li Fittjayê bi hev ra pêşengehekê li ser babeta *Kurdên Anatoliya Navîn* li dar dixin. Çawa tê zanîn *Mångkulturellt centrum* ev demeke dirêj e hewl dide ku ji bo çandên biyanî muzeyeke taybetî veke. Ji bo vê armancê avahîke nû li taxa Fittjayê tê çêkirin. Ev avahiya vê baharê xelas dibe. Vekirina vê muzeya pirçandiyê bi pêşengeha çanda kurdên Anatoliya Navîn ve destpêdike. Ji bo vê pêşengehê komîteyek hatiye saz kirin. Kesên ku bixwazin di vî warî de alikariya me bikin dikarin bi kovara *Bîrnebûn* re têkiliyan daynin.

Nivîskarê kurd, Yusuf Yesilöz xelat girt

Nivîskarê kurd Yusuf Yesilöz, di 1964'an de li Xelikan/Karayusufê hatiye dinê. Ji 1987'an vir de li Îsvîçrê dimîne. Ji ber romana xwe ya dawîn (*Der Gast aus dem Ofenrohr*) xelatek girt. Ev xelata di roja 13.12. 2002'an de bi destê serekê Belediya Zurichê, Dr. Elmar Ledergerber de hat dayin. Çawa tê zanîn çar pirtûkên nivîskar çap bûne û bi zimanên biyanî jî der çûne. Sala tê romana nivîskar ya bi navê *Meleyê di Camiya Şîn* de çap bibe.

Weşanxaneyeya APEC'ê xelat belav kirin

Weşanxane û Çapxaneyeya APECê di 1988'an de li Stockholmê ava bûye. Çapxane û weşanxane ev 14 sal in ku bi karê çapemeniyê re mijûl e. APECê heta nuha ji 200î zêdetir pirtûk derxistine. Ji %90ê van pirtûkan jî bi zimanê kurdî ne.

Li gor agahdariya ku weşanxane dide û dibêje, ev yeka ha bûye sedem ku ew rewşa ziman û weşangehiya kurdî baştir nas dikin. APEC bi nefspiûkî dide diyarkirin ku çî li derveyî welêt û çî li hundurê welêt, gelek weşanxaneyên din jî hene ku berhemên hêja derxistine. Di agahdariya xwe ya 1999an de weha dibêje: *"Li ser vê yekê em gêhiştin baweriyekê ku bi zimanê kurdî jî berhemên bi hunereke bilind û nivîskarên jîr hene. Herweha em serwextî tiştêkî bûn ku dereng be jî êdî wext e. Wext e ku em salê du berhemên nivîskarên kurd bi xelat bikin. Vê yekê em ji ber du tiştan dikin:*

- Serbilindiya me ye ku em qedirê nivîskarên xwe bizanin û rûmetekê bidin karên wan.

- Ya duyem jî marîfeteke welê çima ji bo me na?

Belê, îsal sala sisiyan e ku APEC di meha 12an de, li Stockholmê di Pêşangeha Pirtûkên Kurdî de du kitêbên kurdî bi xelat dike. Îro jî di Pêşangeha Pirtûkên Kurdî de hat beyankirin ku kitêba DILAWER ZERAQ û kitêba ROŞAN LEZGÎN bûye xwediyê Xelatan. Dilawer Zeraq ji Farqînê û Roşan Lezgîn jî ji Liceyê ye. Kitêba Dilawer ji neh kurteçîrokên kurmancî pêk hatiye û bi navê **Kakil** di nav weşanên Sîyê de derketiye. Kitêba Roşan Lezgîn jî ji deh kurteçîrokên dimilî pêk hatiye û bi navê **Binê dara valêre** de di nav weşanên APECê de çap bûye.

Juriya APECê di beşeke motîvasyona xwe de ji bo Kakila Dilawer Zeraq weha dibêje:

"Bi vegotinên zimanekî xweş û dewlemend, bi hevokên rewan û kurmanciyeye hercayî, Dilawer Zeraq ev novelên bi motîvên balkêş, bi teknîk û estetîkeka hunerî, bi bal û hizreke fireh, bi êşeke ruhî û nostaljiyeye nerm hûnandine. Vehûnandinên evan novelên Dilawer Zeraq xwendevan bi xwe re dibe Diyarbekira bi kevirên reş, dibe û dike nav jiyana merivên bextên wan reş... bi wan re meriv li Mêrgahmedê, li Derê Çiyê, li Xançepekê û li derûdora Bedenê digere û meriv xwe bi xwe dibêje: "Xwedêyo, zarokên welatê me, zarokên bajarê me ketine çî rewşê!"


Binê dara valêre de



a

Roşan Lezgîn

Berga kitêba Roşan Lezgîn a bi navê **Binê dara valêre**



Berga kitêba Dilawer Zeraq.

Ji bo kitêba Roşan Lezgîn a bi navê **Binê dara valêre** jî juriya APECê dibêje:

"Verê heme çî seba ke hîkayeyê Roşan Lezgînî hetê edebî ra xurt û pêt î. Hîss û heskerdena kurdan weş îfade kenê. Heto bîn ra lehçeya kirmancî, yanî zazakî de hîkayeyî zaf kêmi nusîyayî û Roşan Lezgînî bi hîkayeyanê xo beno nimûneyêka baş e, bi nê hîkayeyan edebiyatê kurdî rê xizmet keno."

Juriya Xelata APECê:

Ferhad Shakely, Hesenê Metê, Mahmûd Lewendî, Xebat Arif, Amed Tigrîs û Elî Çiftçî.

Heta nuha APECê ev berhem xelat kirine:

- 1 Xelata 2000-î (berhemên ji bo ciwan û zarokan):
M. Emîn Bozarslan - ji bo berhema bi navê *Gurê Bilûrvan* (kurmancî)
Letîf Helmet - ji bo berhema bi navê *Dîwanî Mindalan* (sorani)
- 2 Xelata sala 2001-ê (ji bo wergeran):
Osman Özçelik -ji bo romana *Rojeke Îvan Denîsovîç* a Aleksandr Soljenîtsîn (kurmancî)
Anwar Kadir -ji bo çiroka *Miyoy Miyoykey Min* ya Astrid Lindgren (sorani)

XELATA ÎSAL (14-12-2002)

- 3 Xelata 2002-an (ji bo berhemên edebî):
Roşan Lezgîn -ji bo berhema *Binê dara valêre de-kurteçîrok-* (dimilî)
Dilawer Zeraq -ji bo berhema *Kakil* -kurteçîrok- (kurmancî)
- 4 Xelata sala bê, 2003-an (ji bo berhemên faktayî /15-12-2003)

Şertên beşdariya berheman ev in:

Divê berhem ji du salan ne kevintir be. Ji bo ku juriya APECê bi silameti karê xwe bi rê ve bibe, berhema namzedê/a pêşniyarkirî divê heta 1ê meha 9an bigihîje destê juriyê.

Ji bilî juriya APECê kî bivê dikare namzediya berheman pêşniyaz bike. Lê ji bo silametiya karê juriyê, baştir e ku xwediyê pêşniyazê bi xwe jî agahdariyeke pêşin ji bo juriyê bi rê bike. Nemaze ji bo namzediya berhemên nava welêt pêwîstiya juriya APECê bi alikariyeke welê heye.

Xelata APECê 20 000 kron e û li herdu berheman dabeş dibe. Bi gotineke din, ji bo her pirtûkekê 10 000 kronê swêdî ye.

(14.12.2002)


Mustafa Can Xelata Rojnamegeriya Mezin (Stora Journalistpriset) ya sendika rojnemewanên Swêdê wergirt.

Mustafa Can bi xwe kurdê bakûrê Kurdistanê ye.

Li Swêdê perwerde û xwendina xwe ya bilind a rojnamegeriyê xilas kiriye. Mustaf Can di rojnameya rojane ya Swêdê ya herî mezin, *Dagens Nyheter*ê de kar dike.

Em li vir Mustafa Can pîroz dikin û her berdewamiya serkeftina wî hêvî dikin.

Red. Bîrnebûnê



SUZAN SAMANCI hat Stockholmê



Dîmenek ji civîna danasîna kitêba Suzan Samanci

Foto: Anders Rydell

Nivîskara kurd SUZAN SAMANCI ji bo danasîna wergera pirtûka xwe ya bi zimanê swêdî *Skatten från Halabja* hate Swêdê. Pirtûka wê ya bi navê *Reçine Kokuyordu Hêlin* ji zimanê Tirkî hatiye wergerandin. Pirtûk di nav weşanên APECê de derçû. Di 12.12.2002 an de li lokala Weşanxwana Apecê ji bo medyayê danasîna SUZAN SAMANCI û kitêbê hat kririn.

SUZAN SAMANCI li Stockholmê tevî çend çalakî û şahiyên din jî bû. Di Pêşengeha Kitêbên Kurdî, roja 15.12.2002`an de Apecê civînek ji bo SUZAN SAMANCIyê amade kir. SUZAN SAMANCI di vê civînê de li ser wêje û hunerê wêjeyî axaftineke kurt kir û di dawî de çîrokeke xwe xwend.






Foto: Anders Rydell

SUZAN SAMANCI, Stockholm 2002

SUZAN SAMANCI, 1962'an de li Diyarbekrê hatiye dinyayê. SAMANCI bi şîrê dest bi edebiyatê kiriye. Di 1985-87 an de di kovara *Sanat Olayı* de helbestên wê hatine weşandin. Novela SAMANCI ya evel *Eriyip Gidiyor Gece* û di 1993 an de *Reçine Kokuyordu Hêlîn*, 1996 ande *Û Kıraç Dağlar Kar Tuttu*. 1997 an de *Xelata Çiroka ya Orhan Kemal* stend. 2001'ê de ji kitêba xwe ya bi navê *Suskunun Gölgesinde* derket. Kitêbên SUZAN SAMANCIyê heta niha bi zimanê almanî, flamanî, macarî, kurdî, spanyolî û swêdî hatine weşandin.


Semînerek ji bo jinên Kurdên Anatoliya Navîn

Di roja 17.12.2002'an de SUZAN SAMANCI ji bo jinên Anatoliya Navîn afaxtinek kir û çîrokeke xwe xwand. Civîn li taxa Fittjayê pêk hat. Çawa tê zanîn li vê devera Stockholmê gelek malbatên ku ji Anatoliya Navîn in, dijîn. Di dawiya civînê de nivîskarê bersîva pirsên guhdaran da û her wusan jî pirtûkên xwe îmza kir. Dora bîst kesî tevî civînê bûn.

Bavê BEKIR DARI çû rehmetê!

Bavê BEKIR DARI (endamê redaksiyona me) wefat kiriye. Vê xeberê em gelek xemgîn kirin. Em bi navê kovara Bîrnebûnê ji Bekir û malbata wî re careke din dibêjin: **Serê te û malbata te sax be!**

Li jêr, em name û wêneyek heval Bekir ku ji bo bavê xwe amede kiriye diweşînin. Em qet têkilî naverok û forma nameyê nebûn, wek orjînal bi destnivîsa Bekir ve diweşînin:



Nameya destnivîskî ya Bekir Dari.

Xwendin û Feqîtî

Navê feqî ji gotina Erebi ya Feqîh ku koka wê jî fiqh e, çêbûye û bi maneya şerî'etnas e yanî şarezayê bi zanîna şerî'etê ku qanûn û zagona dîne îslamê ye; lê di nav Kurdan de formeke Kurdî girtîye û ji bo xwendevanên ku li hicr û mizgeftan dixwînin, hatîye bikaranîn.

Qenc nayê bîra min ka gelo payîza dawî ya sala 1963yan bû yan jî ya sala 1964an bû ku ez cara duyemîn ji bo xwendina medresê ji mal derketibûm û çûbûm feqîtiyê, min li gundekî din yê biyanî yî nenas dixwend. Ev gundê ku vê carê min cihê xwe lê çêkiribû û lê dixwend hem ji yê cara berê dûrtir bû û hem jî feqîtî û xwendina lê bi rêk û pêktir û bi disiplintir bû.

Cara pêşî ez li gundekî nêzî gundê xwe bûm û hima çî bigir her êvarên înan diçûme malê lê vê carê bi heftîyan û carina meh jî diqedîya ku ez nedîçûme malê. Her weha xwendina li wê derê jî ji ya cihê berê zahftir bû, mitale yanî dubarekirina dersa çûyî û amadekirina dersa bê gelekî zêdetir bû, metinxwendin, jiberkirina dersa rojane û rewakirina dersên berê du caran ji yê devera din pirrtir bûn. Lêbelê ji van hemîyan jî zortir bêguman dûrbûna ji mal, yanî xerîbî, xwarinên cuda yê herêmî û sermaye wê derê bû ku ji cem me dijwartir bû.

Erê çawa ku hate gotin em di dawîya payizê de bûn û hêj hinek bi temartina xubarên xwe yê dawî ve mijûl bûn, lê her ku diçû serma bêhtir dibû û çilê hîr bi lez û bez ber bi me ve dihat. Bi hatina zivistanê re jî keftelefteke mezin ketibû nav gundîyan; wan ji alîyekî ve ji çiyê ji nav satarên xwe û yê bêsatir ji daristanê darşewat, êzing û ardûyên xwe dikişandin û ji hêla din ve jî emê terş û tareşên xwe dihewandin.

Gundê ku me lê dixwend ne ewqas mezin bû, lê ne piçûk bû jî lewra xutbe lê diket û ji bo xutbê jî çil zilamên alîcîh û saxlem divê û ew jî himberî 30-40 malî dike. Gund li cihê bilind î hewale hatibû avakirin û piştî xwe jî weke ku gotina pêşîyan ya 'Piştî xwe yan bide mêrekî çê yan jî çiyayekî asê' bîne cih, dabû çiyayê **Gurdilan**. Ji hêla jorîn ve jî kêleka xwe dabû çiyayekî bilind ku serê wî digihîşt ber perrê esmana û ji rexê jêrî ve jî xwe sipartibû çiyayê **Qirqêfê**. Çiyayê **Qirqêfê** yekî sertûj î asê bû, navsera wî jî ji bêndereke piçûk î berpâl mezintir bû û di jora wî de jî dikanokek û di nîvê dikanokê de jî goreke pîrî dirêj hebû. Ew bi gora **Nebî Nûh** navdar bû û di biharan de xelk bi mebesta zîyaretê derdikete ser lê ji ber bilindîya wî hilkişîna ser gelekî zehmet bû û ji şiverêkekê pê ve tu rê

nediçûnê. Ji milê gund ve binê wî firîne-keke kûr bû û birrek û xindeqên asê tê de hebûn, bes çayeke (cobareke) têrav jî di xwara wê firînekê de diherikî û wê deverê şên dikir. Ji xwe li hêla **Qirçêfê** ya din jî dahl û devîyên bêhimê (pirr î zahf) hebûn û xwe digihîstandin qûntara çiya-yên hawîrdor.

Li ser xweşî û şênîya vî gundê me ev xeberûşk dihat gotin: "**Eynik û Eyndar Bêkend û Minar** xwestir e (in) ji textê xwendkarî, Yanî ev her çar gundên han (Eynik, Eyndar; Bêkend û Minar) ji textê sultanin jî xwestir in. Bi rastî jî ez niha nizanim lê çaxê ku min ew dîtin hingê ew her çar jî gundine pirr şên û pirr xweş bûn. Aqarê gund hem li çiyê hebû ku jê dar û berên xwe diçinîn û terşê xwe lê xwedî dikirin û hem jî li deştê hebû ku lê cot û çandinîyên xwe dikirin, û dext û danê xwe, qût û mûnetê xwe jê hiltanin.

Çawa ku tê bîra min em 8-9 feqîyên xerîb bûn û ji bilî me jî 3-4 hebên gundî hebûn. Ewên gundî hê derneketibûn faqîtiyê, çendî ku li gor adetê xwendina medresê piştî çend kitêbên destpêkê yên dema **suxtetîyê** pê ve êdî mirov li gundê xwe nedixwend jî. Bi pirranî serê pêşî mirov diçû gundekî nêzîkî xwe û demek piştê jî gava ku mirov fêr dibû hingê berê xwe dida gund û bajarên cihê cihê û li gor radeya xwendina xwe li cem melayê bi nav û deng û zanatir digeriya.

Erê, di rojek ji wan rojên payîza dawî yên tavxweşî î şêrîn de bû em hemî li çolê li ser girekî pahnava fireh ku şûnên miştaxên mewîjan û esîrgehên tirî lê hebûn, civiyabûn. Em kêman caran weha li ser hev pêkve diman, çiku gundên çar hevalên me yên zewicî nêzîk bû û çî bigir hima her êvarên înan ew diçûne mal û rojên şemîyan vedigeriyan. Lê ez hêjî nizanim bê ka gelo ji bo çî ew wê îne

neçûbûn malê, bes sedem çî dibe bira bibe bi gelemperî feqî hemî û bi taybetî jî em yên piçûk bi vê mayîna wan gelekî şah bûbûn. Em piştî tayînên serê sibê derketibûn çolê û heya nîvro me bi leyîstikên curbicur yên mîna birrê, qûçê (kêlê), tefşê û avêtina her cureyên kevirê qewetê weke yên yeklepî, berxweş, yên sermîlan û yên din leyîst. Di pey de jî piştî avêtina çend cureyên sêgavê me dest bi gogê kir û tam hingê jî Sofî Xelîl ber bi me ve hat.

Sofî Xelîl yekî gundî bû, gelek di nav feqîyan de mabû û bi wan re rabûbû û rûniştibû. Li gor ku digot ew nexwendî bû lê piştî ku li leşkerîyê fêrî xwendin û nivîsandinê bûbû wî gelek çîrok û cengnameyên bi nav û deng xwendibû û ew jiberkiribûn; temenê wî li dora pêncîyê bû heya tu bibêjî gotinxweş û zarşêrîn bû; bi hatina wî re geşt û seyrana me hê xwestir û geştir bû. Ew hat ne hat wî kevirê pêşî avête her çar "feqîyên înoyî" ku wî ev nav li wan danibû: "*Ma we rojên xwe şaş kirine yan jî hûn ji derb ketine? Belkî jî xanimên we hûn qewirandibin*". Pa qê "înoyên" me di bin gotina wî de dimînin, yekî ji wan pêr pêre got: "*Na me şaş nekirîye lê vê îne dora bav û diyên me bû ku loma em livê derê mane*". Ji xwe diya wî bi xwe ji wî gundî bû û pismama wan bû jî; loma jî çendî Sofî Xelîl weke ku li eynê xwe dananî û berê xwe zivirand alîyê dinî lê diyar bû bê çawa derbê ew hingaft. Piştê jî wî berê xwe da Mele Hacî û ji nerma xwe ve kevirê guvaşte wî jî "*Way way way lê binê ev Mele Hacî ye, Mele Hacî ma te xêr e li van deran? Xwedê zane yan gurek mirîye yan jî hêstirekê ber avêtîye*". Di pey hinek tinaz û pêkenînan de wî got: "*De ka dev ji gogê berdîn lo, ew bi van kaşûyan nayê leyîstin lê hey hûn hemî weha li ser hev in, rabin em bêlimteyekê lêxin û piştê jî ji me re çend qewl*

û qesîdeyan bibêjin. Ev demeke dirêje ku hûn weha negihîştine ser hev.”

Bi gotina wî re me hemîyan pêkve li çepka xist û em rabûn

Li himberî hev bûne du rêz û Sofî Xelîl dest bi strana "Lawiko Mele Îsa ca dilê min emrê te" kir, me jî lê wekiland û reqande bêlimtê ta ku em westîyan û xwîdan ji me şirrikî hate xwar. Em tev ketin erdê, me qasekî xwe li ser gîyayê dirêj kir, dûvre hinek hevalên dengxweş çend beyt û qesîdeyan ji me re gotin û em hêdî hêdî rabûn vegeîyan mizgeftê.

Heya hingê Mele Hacî qet nedikete nav leyîstikê feqîyan, timî ji civatên wan direvîya û heyra ku jê dihat xwe bi tenê dihişt. Li ser bextê wî be ew bi xwe xelkê welatê jorîn (serhedê) bû, ev heft sal bûn ku li derî û dertûlan bû û ji bo xwendinê bê ku here mala xwe li deverên cihê cihê geîyabû lê rewşa wî bi xwe hem ji feqî û hem jî ji gundîyan hemî re ne pîrr rohnî nînbû. Ji bilî ku ew nedikete nav civat û leyîstikê me her weha ew qet rojekê jî dernediket dervayê gund, nediçû bajêr û bi mêvanî jî nediçû gundekî din.

Feqî di salê de carek du caran li gundan yan jî li gundê ku lê dixwendin digerîyan. Carek havînê ji bo zekatê li ser benderan digerîyan û ya din jî di sersalan de ji bo civandina sersalê li gundên nêzik digerîyan û gelek feqîyên mîna Mele Hacî jî ku bi salan nediçûne malê aboriya wan li ser wê zekatê û wan diravên sersalan bû. Feqîyan bi wan diravan ji xwe re kitêb û kincên pêwîst dikirin û xwarina wan jî ji xwe çawa ku tê zanîn li ser tayînên gundîyan bûn. Ji bilî van herduyan gereke feqîyan ya din jî hebû ku vê dawîyê hima çî bigir rabûbû, ew jî gera ji bo geşt û seyrana feqîyan ya navdar bû. Gava bihar dihat, şînayî û zêzewat pîrr dibû û goştê kar û berxan xurt dibû, hingê wextê geşt

û seyrana feqîyan jî dihat; ew cote cot bi gund û malên xweyterş diketin û ji nav wan kar û berx ber hev dikirin. Ji malên der û dorên xwe yên nas jî rûn û savar dicivandin û êvarên înan bi dost û hevalên xwe ve derdiketin geşt û seyrane û diçûn serê girekî bergehxeş î hewale yan jî mêrgeke bi kanî. Wan li wê derê berx û karên xwe digurandin, dipijandin û bi kêf û şahî, bi govend û bêlimte û bi henek û laqirdî dixwarin.

Piştî wê xwarina goşt û savarê ya pîrr mirov texmîn nake ku feqî êvarê dê karibin herin **tayînên** xwe, lê na herê ma feqî dev ji tayînan berdidin. Di nav xelkê de belav e tê gotin ku, carekê feqîyên devereke hemî birçî bûne û li hicrê li hev civîyane ji xwe re behsa xwarinê dikin; yek ji wan dibêje: "Xwezî vêga hicra me heyra ber qarçika tijî kutilk yan jî aprax (pel) bûna." Yên din dipirsin: "Ma em dê di ku derê de biçûna **tayînan**?"

Bêguman weke ku ji jor jî tê zanîn di jiyana feqîyê de cihekî **tayînan** yan jî **rati-ban** yê girîng heye û feqî bi xêra serê **tayînan** dikarin bixwînin û li xwendina xwe bidomînin. Di gund û bajaran de malên dewlemend î camêr sibe û êvaran malên halxweş, dewlemendên ne merd û malkêmên çavfireh jî danekî tayîna feqîya derdixin. Yanî bi gelemperî Kurd ji bo belavbûna zanîn û xwendinê li gor rewşa xwe ya aborî bi xwendevanan re alîkarî dikin û wê alîkarîyê jî ji xwe re weke erkeke dîni û netewî dibînin, pê xwe serbilind û bi rûmet dikin.

Hatineke din ya feqîyan jî **îsqat** e, ku gava yek dimire mîratxurên wî yan li gor temîniya (wesyeta) wî yan jî li gor malê wî çend kêl genim hem ji bo xêra wî û hem jî ji ber kefarete gunehên wî ve didin. Pîranîya îsqatê digihîje feqî û melan lê hinek jî jê digihîje feqîrên gund. Ji ber



Çend berbirsiyarên medresa Norşînê. Ji rêza navîn, ji milê çepê kesê sêwemîn: Şêx Meruf, kesê çaremîn: Şêx Masûm, kesê pêncemîn: Şêx Taha (Ji arşîva Giyasettîn Emre)

vê yekê mirtib (cengene) gelek caran yarîya dikin û dibêjin: "Em dixwazin xelk zêde bibe çiku gava zarûkek çêdibe em bexşîşa xwe distînin lê feqî û mele divên ku xelk bimire lewra ew îsqatê distînin."

Bêguman meletîya remezanê jî ku feqî di meha remezanê de diçûn li gundên bê mele meletîya remezanê dikirin, wan radikirine paşîvan, azan didan, li pêşîya wan nimêj dikirin û fitrên wan xweş dikirin, hatineke feqîyan ya din bû. Ji bilî vê jî hem ji wan kesên ku meletîya remezanê dikirin û hem jî ji yê din re ji xwendina **xitman** û **dewrên salê** jî hatinek dihat. **Xitma Quranê** ew e ku di malên wan de yan jî li mizgeftê her roj cuzûyek **Quran** ji wan re dihat xwendin, piştî sih rojê ew diqedîya, xitim dibû û xêra wê digihîste rihê dê û bav û kes û mirovên wan. **Dewra salê** jî ew e ku salek salewext her roj sûretê Yasîne bê xwendin û xêra wê

teslîmî rihê dê û bav û kes û mirovên dawxazkarî bê kirin. **Xitma salê** jî salek salewext her roj xwendina cuzûyek (10 pel) Quran e.

Mele Hacîyê me çawa ku berê jî bihurî, pêşî pirr sar bû û ji civatê jî direvîya lê çendeyek piştire piştî seyran û leyîstikên me hino hino vebû û çî qas çû dest pê kir gelek serpêhatîyên xwe ji me re got û carina tinazan jî bi me feqîyên piçûk dikir:

"Rebena we çî dîtîye? Gava em weke we bûn taliban çî bi me dikir û çî nedikir; wan destê xwe ji ava germ nedixiste ya sar û bi qasî serê zilekî jî kar nedikirin. Hesreta me bû ku em ji ber suxreya wan kêlîkekê bi filitin û ders û metnên xwe bi xwînin. Ji tayînan bigire ta firaqan, ji êzingsikandinê bigire haya sobedagirtin û pêxistinê hima çî kar û barên wan hebûn tev bi me dikirin di ser de hê jî ew ne qayîl bûn û dixeyîdîn, digotin: 'Çima hûn

dersên xwe qenc rewa nakin, metnên xwe naxwînin û muzakere nakin.' Bira bavê min xêr nebîne ku şîreteke li min nekir, nexwe ez dê ji bo çî bihatima cihekî ku talibî lê qet pere nakeî.

Di her 13-14 salên dema xwendina xwe de bes min du cihên ku li wan talibî tinebû û taliban jî weke yê din karê xwe dikirin û diçûne tayînan, dît û min li her du cihan jî xwend. Yek jê ev der bû û yê din jî gundekî din bû ku ev seydayê me yê niha piştîre çûbû lê bûbû mele û ez jî di destpêka talibîya xwe de çûbûm cem û heya dawîya xwendina xwe jî li wê derê mabûm. Ji xwe li gelek cihan tew mîrê hicrê jî hebû ku derdê wî qet nedihate kişandin lê baş bû ku vê dawîyê ber bi rabûnê ve diçû.

Erê lê, heçî **metn**, **mitale** û **muzakere** bingeh û hîmên xwendina feqîyê ne, bê wan ji xwe xwendina feqîyan vale ye û pûç e, lewra mirov hima çî bigir li ku derê dibe bira bibe dikare seydayekî bibîne û dersê jê wergire lê ew atmosfera pêkve **muzakere** kirinê bes li mizgeftê di nav feqîyan de peyda dibe. Încar bi saya wê **muzakerê** mirov dersa xwe û dewrên xwe rewa dike, yanî kitêbên ku berê xwendîne bi feqîyekî raserî xwe re dubare dike, xwe bêhtir tê de fêr dike û tiştê jibîrkirî bibîr tîne. Her weha yê ku mirov ji wan bihurîye jî mirov bi wan re dersên wan **muzakere** dike û dewrên wan jî bi wan rewa dike û yê xwe jî tîne bîra xwe.

Metnê kitêbê bi maneya bingehê wê yê bê şîrove û bê rave ye û di nav feqîyan de jî ji bo kitêbên rêziman û qaîdeyên giramera Erebi yê kurt tê gotin. Feqîyan şîroveyên **metnan** bi dersîti dixwend lê **metn** jî ji berdikirin. Ji ber vê yekê jî bingehê xwendina feqîyan jiberkirina rêzimana Erebi, qaîdeyên xwendin û bilêvkirina wî û zêr û ziberkirina yanî rast-

xwendina zimanê Erebi bû. Piştî van qaîde û awayê rast nivîsîn û rast xwendîne fêr dibûn êdî dest bi xwendina kitêbên dîni û olperstî yê mîna şerîet û tefsîrê û yê din dikirin.

Feqîyên **talib û bermuntahî**, (**musteîd**) her tim **mitale** dikirin û ew mitale dibû xeyala her feqîyê **destpêkir** (**mubtedî**) û li hêvîya wê rojê bû ku bigihîjê û heya derengî şevê li ser şîyar bimîne yan jî berdestê sibê rabe û **mitale** bike.

Di wextê mitalê de ne deng bi tenê divê çitîn jî ji kesî derneketina; wan lembê datanî ser qotikê hicrê (qotedarek bû ku jê re hicrê jî dihate gotin) û ew hemî li dora wê dicivîyan û kolî ser kitêbên xwe dibûn. Wan piştî her demeke diyarkirî navbirek didayê û piştî jî dîsa lê didomandin, lê bi rastî her ew yariyên wan yê navbiran bûn ku bêhtir hesreta mitalê dixiste dilê feqîyên radeya xwarîn.

Belê em di nav xwendin û mitalê de kol bûn û me Mele Hacî jibîr kir; lê em ê dîsa bizivirin cihê ku me ew lê hiştibû. Weke ku min berê jî got ew Mele Hacîyê me yê kovî bi tavayî guherîbû û ji dêlva wî Mele Hacîyê xwînsar, tenêmayî û bêtêkilî ve yekî xwîngerm, zarxweş û dilsoz hatibû û hima ku weke riya çûçokê jî keys pê diket ew dihat nav me, bi me tinazan dikir û ji me re metelok û leqemokan digot. Berê wî qet ne dersa kesî dida û ne jî bi kesî re **muzakere** dikir lê vê dawîyê wî hem dersa hinek feqîyên gundî dida û bi me re jî muzakere dikir.

Carekê dîsa em hemî li hicrê ne, seyda ders dide, hinek lê guhdarî dikin, hinek jî bi hev re muzakere dikin û hinek talib jî dersa me feqîyên piçûk didin. Seyda di ber xwe de bişirî û ji dersê rawestîya, me hemîyan pêkve li alîyê wî nihêrt ku feqîyekî gundî ji Mele Hacî dipirse: "Seyda *"be'du îsmekî mufred î me'rife ye"* yanî

çi?" Ez fêm nakim. Mele Hacî got: "Tu çawa fêm nakî? Ma ne **Terkîba Kurmancî** ye." feqî pê da erdê û got: "Seyda Kurmancî be jî ez tê nagihîjim, ez çi zanim ku 'bi sebeb îdafedana wê bi bal ma be'dê wê ve ku zemanî ye' tê çi maneyê." Wî got: "Belê, belê tu dizanî, de were"

Piştî vê gotinê Seyda kenîya û kete nav peyva wan ji faqî re got: "Lawo çima tu li pey seydayê xwe naçî? Ew dê te zû bi firrê bixe"; Berê xwe da M. Hacî jî û got: Mele Hacî ji bo çi tu weha bilez î? Wa ye ew ji te fêm nake"


Mele Hacî got: "Seyda ne ku ew fêm nake lê ew ji **mefûtûhanê** direve; bira zû pirtûka xwe biqedîne ku **mefûtûhaneya** xwe bide. Ji mêj ve ye me çay venexwarîye û em jibo çayekê kewijîne."

Kêf û şahîyeke feqîyan jî ew bû ku yek kitêbekê biqedîne û dest bi yeke din bike û meftûhana xwe bide yanî ji bo destpêkirina bi kitêba xwe ya nû zîyafeteke çayê û fêkî ji feqîyan re pêşkêş bike.

Rojekê em li kavilekî pišta mizgeftê weke gera hepsîyan diçin û têt û metnan dixwînin me bihist ku ji pişt dîwêr dengê xortekî gundî tê, ji talibekî kevn re dibêje: "Seyda çima wextê Mele Hacî diçe tayînan wisa dike?" Talibî pirsî: "Ji bo çi, ma wî çi kirîye?"

Wî got: "Seyda gava ew diçe tayînan ew çer alî li hawîrdorê xwe dinihêre, destê xwe dixê berîka xwe û ne bi minê ne bi teyê xwe rast û çep li ba dike û diçe. Ma qê hûn weha tayînan tînin?"

Xortekî din got: "Na herê evên din hemî gava diçin tayînan serê wan timî di ber wan de ye, hew li pêşîya xwe dinihêrin û ku kes wan nede xebardan ew li nav gund bi ti kesî re napeyîvin jî." Xortekî din kete nav peyvê û got: "Ew kincên xwe jî pîrr qirêjî dike û hê ji bo



Meleyek ji Erzurumê (Ji kitêba William Dalrymple ya bi navê *În Xanadu-A Quest*, 1989)

şûştinê dibe malan, ji ber vê jî xwedîyên malê jê gazinan dikin."

Talibî got: "Heyra hûn doza çi li feqîrê min dikin, belkî kincên wî yekbedêl bin; ev heft salên wî ne ku neçûye malê û ji ti deverên din jî jê re dirav nayên. Ya rastî ka malbata wî heye tine jî kes nizane, ger hûn ji dêlva wî ve bûna belkî we ewqas jî nediqedand, we nikaribû hûn bixwînin jî."

Ji xwe mala ku tayîna feqîyekî dida kincên wî jî jê re dişûştin, ku pêwîst bûna jê re didirûtin jî û carina li gorî lazimatî û rewşa aborîya malê livîn jî didanê. Yanî feqî dibû weke kurekî malê û her pêwîstiyên wî yên rojane li gor qeweta xwedîyê malê dihatin pêk anîn.

Belê weke ku tê zanîn û li pêş jî bihûrî xwarin û debara feqîyan li ser tayîna bû; her sibe û her êvar her feqîyek diçû ber derîyê malekê û xwarina xwe ji wê derê dianî. Bêguman hinek malên dewlemend jî hebûn ku têra çend feqîyan yan jî hê

bêhtir xwarin didan lê di wextê me de ew ne gelek bûn. Ji xwe ew xwarina ku ji nav mala dihat ya feqîyan hemî bû, wan firaq bi firaq ew datanîn ber xwe û kefçiyên hemîyan pêkve diçûn wê firaqê û piştre ya din dihate danîn û her bi vî awayî lê didomandin.

Vêca ger li ser xwarinê tiştêkî taybetî weke goşt û masî û xwarinên weha yan jî fêkîyên hişk bihatina hingê wan ew **qur'e** dikir yanî çend feqî bûna dikirin ewqas beş û pişk dikirin yek dibû **mele** û yek jî dibû **qar**. Yê ku dibû **mele** ji xwe re ji nav wan dibijart û yên din jî bi rêz li pey wî ji xwe re radihiştin beşekê û beşa dawî jî ji yê **qar** re dima.

Qur'e jî weha çêdibû:

Ji nav feqîyan yekî davête yê din (yanî digot):

- Hate te çend (yanî hejmarekê ji xwe re bigire) yê din jî digot:

- Hate min 8 (yanî min hejmara 8an ji xwe re girt), wî jî digot:

- Hate min jî 10 (yanî min jî 10 ji xwe re girt).

Ev hejmar jî weha dihatine hesabê: Hejmara yê pêşî yanî 8 du car dibû û ya din jî dikete ser: $8+8=16+10=26$

Vêca ji yê ku hejmara pêşî girtibû dest bi jimartinê dihate kirin û hejmara 26 li kî ketina (yanî kê bibûna bîst û şeşemîn) ew dibû mele û yê çepê wî jî dibû qar; **mele** dest pê dikir û **qar** jî dima dawî. Carna hebû ku tiştên **qur'e** kirinê têra hemîyan nedikir hingê ew dikirin çend beş û qur'e (pişk=par) dikirin **mele** û ber bi rastê xwe ve heya kesê ku dor digihîstê jê dixwarin lê **qar** û ber bi çepê xwe ve bêpar diman.

Li ser gazina wan xortan M. Hacî weha bersiv da: "Lo de heyra hima bira ji xwe re bibêjin; ji xwe çawa tê gotin: 'Eyba mirov mîna kezîya li piştê ye ji mirov ve nayê xuyan lê ya himber mirov dixuyê'.

Vêca ew jî weha ne ya xwe nabînin ya me dibînin lê de xem nake."

Yekî got: "Mele Hacî mirovê xwenda î talib weke îzalix e leke zû lê xuyadikin û ji ber vê yekê jî divê haya wî ji rabûn û rûniştina wî û ravêjen wî hebe û timî di hizrê xwe de be."

Wî got: "Na bavo ne talibîya we û ne jî rabûn û rûniştina we ez ê pê çî bikim". Yekî got: "Seyda ma. . ."

Mele Hacî gotina wî birfî û got: "Ez ne seyda me, Seyda wa ye li hundur ders dide."

Wî jî got: "Ma te jî ew roj ders nedida?"

M. Hacî bersiv da: "Ew ne lê bû, çiku ew roj seydayê wî ne li mal bû loma min dersa wî dida û ji xwe ji berê ve jî ez ji xwendina **Terkîba Kurmancî** hiz dikim lewra çendî ku ne Kurmancîyeke xwerû ye jî lê bi awayekî xweser hatîye nivîsîn."

Yekî din pirsî: "Seyda ma tu ji **Zurûf** û **Tesrîfa Kurmancî** re çî dibêjî?"

Mele Hacî bi'înt got: "Çi seyda, seydaya te ye mam xulam? **Zurûfa Kurmancî** erê ew jî xweser e lê **Tesrîf** yekcar tu tişt jê nayê fahmê û ji bo ku mirov têbighije divê mirov berê qaîdeyên **serfê** (lêkernasîyê) qenc bizanibe. Bi rastî ku bi ya min bûna min ji kitêbeke kurt weke **Tesrîfa Mele Elîyê Eşnewî (Şinoyî)** û **Emsûleyê** pê ve ku hima çî bigir kişandina hemî lêkerên Erebi yên serdema navîn rêz dike, gişan ji nav kitêbên rêzê derxistina."

Bi van pirsên dawî babeta axavtinê ya gilî û gazinan guherî û berê wê kete ser Şopeke din û yekî ji me pirsî: "Ma Çend kitêbên rêzê hene, ya talibîyê kîja ye û mirov di çend salan de digihîjê?"

Wî got: "Ohoo pir in, hûn jî dê li pêş bibînin. Ka em qasekî metnên xwe bixwînin, piştre ku me navbirekê dayê hingê ez dikarim ji we re bibêjim."

Piştî metnan em tev li dora wî civîyan; wî jî ti mefera xwe nedî û rabû ji me re dest pê kir: "Çawa ku hûn jî dizanin piştî xitm û carîkirina Quranê li pîrrên cihan destpêka xwendinê bi Kurdî ye û **Mewlûda Kurmancî, Nûbehara Piçûkan** û **Nehcilenama Mele Xelîlê dest pê dike; Lê divê bê zanîn ku dema kitêb bi Erebi bin jî dîsa ders bi Kurdî tên dayîn. Ma ne we ye"**

Me hemîyan pêkve bi yek dengî got: "Belê seyda". Wî jî domand: "**Mewlûda Kurmancî** bi xwe pesnê Pêxemberê me ye û **Mele 'Husênê/Hesenê Ertoşî**" ku jê re **Melayê Bateyî** jî tê gotin, ew nivîsiye **Nûbihara Piçûkan** jî ferhengokeke Kurdî-Erebî ye û "ne ji bo sahib-rewacan belkî ji bo biçûkêd Kurmancan" ji aliyê **Ehmedê Xanî** ve bi helbestkî hatiye nivîsîn. **Nehcilenama Mele Xelîlê Sêrtî** jî eqîdeya îmanê û şîret in; piştî wê jî **'Eqîdeya Îmanê** ya **Ehmedê Xanî** tê xwendin. Dûvre du kitêbên şerîetê **Xayet û İbn el-Qasim** tên.

Piştî vanên me got di babeta lêker-nasiyê de li hinek cihan **Tesrîfa Kurmancî** û li gelek cihan jî **Emsîle** û **Tesrîfa el-Zencanî** ku ji aliyê **'Ebd el-Wehab İzzeddîn el-Zencanî** ve hatiye nivîsîn û bi navê **İzzîyê** navdar e tên xwendin; lê li hinek deveran jî **Meqsûd** û **Mera'hê** dixwînin. Li pey wan jî biwêjnasi (morfolojî) û hevokristî (syntaks) tê û ew jî bi **'Ewamila Curcanî** ku sed tewangdêrên rêzimana Erebi bi nimûneyên wan ve rêz dike, dest pê dike. Dûvre jî **Zurûfa Kurmancî** tê ku hokerên Erebi bi Kurdî dide zanîn û li pey jî **Terkîba Kurmancî** ku rûpelê pêşî yê **Ewamila Curcanî** bi berfirehî û bi Kurdî jîrove dike tê xwendin. Ev herdu kitêb jî ji aliyê Mele Yûnisê helqetîne ve hatine nivîsîn. Hima piştî van jî **Se'dullah Sexîr** (Se'dullah Piçûk) û **'Ewamila Bergewî/Bîrkewî** tên.

Heya vê derê xweş diherike lê dûvre **Şer'h el-Muxnî** (Şiroveya Muxnîyê) tê û pê re jî serê mirov dikeve xaxê giran lê bi xilaskirina wê jî mirov ji suxtetîyê derbasî dema feqîtiyê dibe. Yên berî vê hemî bi xwe dihatin jiberkirin lê ji vir û pêve êdî şerh tên xwendin û metn tên ji berkirin. Li pey van dîsa dor tê ser lêkernasiyê û mirov şiroveya **İzzîyê** ya **Mes'ûd İbn Umer Se'd el-Teftezanî** ku jê re **Se'dînî** tê gotin, dixwîne. Li hinek deveran yan pê re yan jî li dûv wê **Tesrîfa Mele Elîyê E'newî (Şino-yî)** jî tê xwendin û jiberkirin û yê ku **Tesrîfa Mele Elî** bixwîne bi piranî herdu şiroveyên wê yên bi navê **Qizilcî** û **Qeredaxîyê** jî pê re dixwîne. Ew herdu jî du kitêbên gelekî zehmet in û bi xwendina wan zihna mirov vedibe.

Hinek berî ku dest bi **Se'dînîyê** bikin kitêbeke bi navê **Sitûrê** ku ji aliyê **Ebdulhekîmê Dêrşewî** ve hatiye nivîsîn, dixwînin û ji ber jî dikin, û li pey wê jî hinek du kitêbên piçûk yên suxenwerîyê dixwînin ku navên wan bi kurtî **Rîsaleh el-Wed'e (el-Lem' fi 'İlm el-Wed'e)** û **Rîsaleh el-İstî'are (el-Werdet el-Nezzare fi-l-Mecazî we-l-İstî'are)** ye û her du jî ji aliyê Mele Ebûbekr Mîr Rostemê Sorî ve hatine nivîsîn. Piştî van jî **'Hel el-Meqa'id** tê ku şiroveya **Qewa'ida Cemaledîn İbn Hîjam** e û bi kurtî li ser hoker, hevok û daçekên Erebi ye. Li pey **'Hellê** jî **Se'dulah Gewre** tê ku **Enmûzeca Muhammed İbn 'Umer el-Zemexşerî** şirovedike. Piştî wê jî yeke bi tifaq û teşqele tê ku navê wê jî **Netaîc el-Efkara Mustafa İbn Hemza Adali** ye û **İzhar el-Esrara Muhammed el-Bîrkî/el-Bîrkawî** şirove dike. Pîrrên ku wê dixwînin tifaqek li wan yan jî li lêzimên wan diqewime û ji ber wê yekê jî kesên mîna min rihşêrîn ji dêlva wê ve **İmtîhan** û **Suyûtîyê (el-Behcet el-Merdiyeh fi Şerh el-Elfiye** ya **Celaeddîn Ebd el-Rehman el-**

Sûyûtî ku şiroveya **Elfiyeya Îbn Malik** e, dixwînin. Hinek bi wê re **Ebû Talibê** jî dixwênin.

Ez nizanîm ku bû çend kitêb û çend sal lê ez dizanîm ku piştî van hemîyan hê mirov dest bi **Fewaîd el-Dîyâiyeh fi TMerh el-Kafiyeh (Mele Camî)** dike û dibe talib. **Camî** jî ya **Nûreddîn Ebd el-Rehman ibn Ehmed Camî** ye û **Kafiyeya Îbn el-Hacib** bi awayekî rêk û pêk Jirove dike. Hê ku ez li ser behsa **Îbn el-Hacibî** me divê ez **şafiyeya** wî jî ku di babeta lêkernasîyê ye de cihêkî wê yê girîng heye û talibê jî nava xwe razê wê dixwînin, bikim.

Piştî destpêka **Camîyê** êdî weke ku mirov bigihîje zanîngehê (unîversîteyê) û pê re mirov dibe xwedîyê payeyeke taybetî ku **talibî** ye. Hingê mirov ji çûna **tayînan**, ji dora paqijkirinê û karên din azad dibe, her weha yek dikare dersa feqîyên jêrîn bide yanî bi awayekî din mirov dibe dersdar (seyda) ku ew jî mertebeyeke bilind û navdar e. Belav e tê gotin: *'Heyra filan mela alimekî mezine feqîyên wî hene, dersan dide, feqîyên talib û muste'îd (bermuntehî) jî her deverî gesta wî dikin ku li cem bixwînin, muntehîyên wî hene îcaze dide'*.

Feqîyê Talib ku karibe dersan bide êdî baş ji kitêbên **Erebî** fêhm dike û hingê bi kitêbên rêze re hinek kitêbên din jî yên mîna **Şerî'etê**, **Tefsîrê**, **Hedîsê**, **Sîyerê**, **Edebîyat** û **Felekîyatê** (Sîtêrnasîyê) weke derseke zêde dixwînin. Li gor saloxan berê **Hendese**, **Hejmar Tarîx** û hinek zanîyarîyên din jî dihatin xwendin lê her ku çû ew ji nav medreseyên kurdî rabûn û bi tenê kitêbên rêzê û hinek jî yên dînî û olperestî man.

Piştî **Camîyê** jî ku demeke dirêj dikişîne vêca dora **Mentiqê** tê û destpêka wê jî bi **Muxnî el-Tulabê** ye ku şiroveya

Îsaxocîya Esîr el-Dîn el-Ebherî ye,² lê li hinek cîyan jî **Îsaxocîya Mela Xelîlê Sêrtî** tê xwendin. Di pey de jî **Qewl el-Ehmed** tê ku ew jî şiroveya **Fenarîya** raveya **Îsaxocîya el-Ebherî** ye. Di babeta mentiqê de hinek kes jî Hesemkotîyê dixwînin.

Li pey vê jî du kitêbên din tên ku navê wan **Rîsaleya 'Wed'ê** û **'Usama Îstî'arê** ('Usam 'Ela el-Ferîdeh) ne.


Dûvre dor tê ser Munazerê ku mirov pê fêrî awayê munaqêşe û gotûbêjê dibe; ji bo wê jî du kitêb tên xwendin **el-Welîd** û şiroveya wê **'Ebd el-Wehab**.

Ya rastî ji **Camîyê** û wê ve ez jî mîna we me çiku min jî hê nexwendîye lê tiştê ku min dîtîye û bihîstîye weha ye.î

Hê gotin di devê wî de û me jî guhê xwe lê tapêl kiribû ka dê piştê çî bê lê dengêkî em veciniqandin û got: "Ez bi **Camîya** te kim te hemîyan xwendîye bes tu lê zivîrî; M. Haçî haydê Seyda li benda te ye."

Dora dersa wî hatibû ew çû dersa xwe lê kula navê kitêbên din heyamekî dirêj di dilê me de ma, bes piştê gava me cihê xwe ji wê derê xera kir û em çûne cihine din ku feqî hê pirtir û bilindtir bûn em hino hino fêr bûn. Încar 6-7 sal piştê jî gava em çar yan pênc kes ji wan feqîyên piçûk î berê bi hev re li gundekî din lê li cem eynî Seydayî civiyabûn em hê baştir hîn bûn. Em giş bûbûn **talib** û **bermuntehî** lê mixab in ku li vê derê jî mîna cîyê me yê berê dîsa talibî tinebû. Bes ji tevî xweştir ew bû ku em di qilasika xwendina xwe de hatibûn destpêka wê, lê hem mezintir û xwendetir û hem jî bi bîr û bawerîyeke bihiştir û serwexttir. Yekî ji me **'Haşîyan** dixwend ku piştî **'Ebd el-Wehabê** dihat û ew jî ji sê kitêban pêk dihat; dido ji wan şagirtê nivîserê **Camîyê** bûn û kitêba seydayê xwe dût û dirêj şirove dikirin. Navê yekî **Ebd-el-Xefûr el-**

Medreseya Gökê li Sêvasê
(Ji kitêba William
Dalrymple ya bi navê *In
Xanadu-A Quest*, 1989)



Larî û yê din jî 'Usameddîn Îbrahîm el-Esferanî bû û navê kitêba wan jî li navê wan bû yanî Ebd-el-Xefûr û 'Usam 'Ela el-Camî. Ya din jî 'Ebd el-Hekîm bû ku kitêba 'Ebd el-Hekîm el-Hindî el-Sîyalkûtî bû û Ebd el-Xefûrê rave dikir. Yekî jî ya piştî Haşîyan dixwend ku li ser mentiqê hê berfirehtir radiwestîya û navê wê jî 'Şerh el-Şemsî bû, gelek kesan jî Şemsîyê pê re ji ber dikir.

Yê li pey wî jî Muxteser el-Me'anîya Se'd el-Teftezanî dixwend ku ew jî li ser bingehê zanîyarîya Belaxetê (suxenwerîyê) yenî Beyan, Mana û Bed'ê ye. Bi destpêka vê re jî talib vêca dibû bermuntehî (muste'îd) yan jî talibê ber întîhayê (ber xilaskirinê). Li pey jî dîsa Şer'h el-'Eqâida Se'd el-Teftezanî dihat ku li ser 'eqîde û kelmê bû. Ev ya berî ya dawîyê bû lê ya dawîyê ku încar diqedîya û

mirov **muntehî** dibû, **îcaze** distand û dibû **mucez** jî **Cem'i el-Cewam'i** bû û li ser bingehê zanîyarîya dînî bû.

Di dema me de di nav kitêbên rêzê hemî de ji bilî her siyên pey **Quranê** ku li pêş bihûrîn bes sê kitêbên Kurdî dihatin xwendin ku me navê wan li jor nivîsî lê li gor **Seydayê Mele Mahmûdê Bayezîdî** kitêbeke rêzimanê Erebî ya **Elî Teremaxî** jî ji aliyê nîşên berî me ve di hate xwendin. Her weha vê dawîyê kitêbeke şerî'etê ku

navê wê **Îrjad el-Îbad** bû û ji aliyê **Mele Yûsuf** ve ku jê re **Xelife Yûsuf** jî di hate gotin bi kurdî hatibû nivîsîn.

Ji bilî van hemîyan gelek çaran di wextê me yê vala de û di şahîyan de **Dîwana Melayê Cizîrî** û **Mem û Zîna Ehmedê Xanî** bi eşq û şewq di hate xwendin; Bi taybetî jî êvarê înanan feqîyên dengxweş ew bi awaz û bi qesîdekî digotin û diavêtin ber hev.

Hinek Medresên kevn yê gelekî berî me ku ez bi xwe nigihîştîme wan ev bûne:

Medresa Sor (Ya ku Melayê Cizîrî lê ders daye)

Medresa Mîr Evdal

Medresa Suleymanîye

Medresa Finikê

Medresa Tanzê, evên han li Cizîra Botan û li dorhêla wê bûne.

Medresa Mîr Hesênê Welî li Miksê

Medresa Sîkal li Westanê

Medresa Xeydayê

Medresa Çolemêrgê

Medresa Bazîdê

Medresa Bedîuzzeman li Wanê

Medresa Şêx Emîn Efendî li Bidlîsê

Medresa Seydayê Taxî li Norşên

Medresa Mûşê

Medresa Mele Xelîlê Sêrtî³

Medresa Narê ya Mele Elaeddîn

Medresa Hezo ya Mele Sebrî

Medresa Tilmiz ya Mele Hesên

Medresa Hehedkê ya Mele Cemîl

Medresa Seydayê Mele Huseynê Kuçûk li Farqînê

Medresa Comanîyê

Medresa Mele Osman Li Zercil

Medresa Bêkendê ya Seydayê Mele Muhammed Şerîf

Hinek ji medresên navçeya me ku di dema me de bi nav û deng bûn û gelek faqî li wan dixwendin ev bûn:

Medresa Seydayê Seyd Hesên li Girikê
Medresa Hawêl ya seydayê Mele Muhyeddîn
Medresa Hola ya seydayê Mele Mihemmed
Medresa Norşên
Medresên Zoqeydê ya Cewwad û ya Şêx Fudeyl
Medresa Têlanê
Medresa Erebkendê Ya seydayê M. Muhemmed
Medresa Şêx Seyda
Medresa Şêx Fexreddîn li Batmanê
Medresa Mozgelanê û ya Çeqeluyê ya
Seydayê Mele Ebdulsemmed
Medresa Seydayê Mele Muhemmed li Eyndarê û li Hiznamîrê
Medresa Sergewra ya Mele Yasîn
Medresa Sergelya ya
Mele Ebdullah
Medresa Tilo
Medresa Helenzê
Medresa Mele Mihemmedê Zivinga Şikakan
Medresa giresîra ya Mele Hawî

Her weha li gelek gundên din yê der û dorên me jî medrese hebûn ku feqîyan lê dixwend: weke Mozgelanê, Kêrikê, Reşîkê, Cimzerqê, Îsyasûnê, Mezirkê, demekê Xîlika, Liçîkê, Gundîkê Qêre, Hehedkê, Şufêrê, Eynkafê, Ernasê, Batê, Xincika,

Aqûba, Subhiyê, Korîkê, Zuxur, Baciftê, Pîleka, Basorkê, Bihezîrç, Dûsadekê, Zêwikê, Kelhokê, Mêliha, Qinaskê, Comanîyê, Miwêlê, Tila Nav Royan, Gundik, Zîla, Kanîkê, Girberêşîk û gelekî din ku navên wan nayên bîra min.

1. Çendî ku di hinek cihan de navê wî Mele Ehmedê Batê hatibe nivîsîn jî lê ew şaş e ya rast Mele Husênê Bateyî yan jî weke li ser bergê Mewlûdê bi xwe dinivîse Mele Hesên Ertûşî ye (binihêre Abdulreşîb Yûsuf, Şaîrên Klasîk ên Kurd, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988, wergera ji tîpên Erebi Elî Şêr) .

Bi rastî ez nizanim bê çima navê wî bûye Ehmed lê bi texmîna min weha çêbûye:

Ji xwe çawa tê zanîn beşa mewlûdê ya dawî ku berî duayên Erebi tê, duayên Kurdî ne û bi risteya "Ehmeda çavê te ma zaxe-l-beser" dest pê dike ku mebesta Bateyî jê Pêxember e, çiku navekî wî jî Ehmed e. Her weha li dawîya beşê jî ew dibêje: **Bo feqîrê Bateyê el-Fatîhe**. Vêca bi ya min yê pêşî ku nivîsiye qenc tenegehîştîye û weha fêmkirîye ku li serê beşê navê xwe nivîsiye yanî "Ehmed" û li dawîyê jî bernavê xwe yanî "Bateyê" nivîsiye û ji ber vê yekê jî navê wî kirîye Ehmedê Bateyî/Batê.

2. Li gor xwediyê el-Muncidê **Îsaxocî** ya şagirîtê **Eflatûn** (platûn) **Pûrfiryûs el-Sûrfî** ye bes weke ya **Esîr el-Dîn el-Ebherî** hatîye qebûl kirin û wisa belav bûye. (Binêre Ferdînan Tûlû, El-Muncid Fî-l -E'lam Dar el-Meşreq, Beyrût, 1973 r. 101). Çendî ku ew weha dibêje jî lê diyar nake ka gelo çawa ew li ser navê el-Ebherî hatîye nasîn; lê dibe ku wî ew wergerandibe Erebi û loma jî şiroveyên wê hemî diyar dikin ku ya **el-Ebherî ye**.

3. Ji nivîsa Mela Ebdullah Telli, Nûbihar, Mehnameya çandî Hunerî Edebî, hejmar 63/64, Îstanbul, 1998; jî destpêkê heta îro Medresên Kurdî r. 5.

MELE REHÎM

Ez ji devera Yunakê me. Ez 26 salî me û nîvê jîyana xwe min li Norveçê derbas kir. Min babeta Mele Rehîm gelek meraq kir. Ev çend sal in ez dixwazim ser vê babetê kar bikim û hin lêkolînan pêk bînim. Min zêde wext û firsend nedît. Di nav demeke kurt de ez ê dest bi xebata xwe bikim. Belkî neghêje vê hejbara Bîrnebûn'ê. Li bal min dengê yekî ku beytên Mele Rehîm dixwîne heye, li ser kasêtê hatiye qeyd kirin. Ji wan hinekan ji we re dişînin, paşê jî ez ê berdewam bikim, tiştên mayîn ji we re bişînim.

Bi rastî Mele Rehîm bi van cotrêzên xwe ez ev kirim heyran û maşoqê xwe. Him kurdûna xwe û him jî dîndariya xwe baş îspat kiriye. Ev zata dijî wan zordestî, êdan, qedexebûnan û tirsfirandinan derdikeve. Ew tîne hinek ji van berhemên xwe bi kurdî dinivîsîne. Angorî kesên din, dema wî ev berhemên dinivîsîn, çî wext dibe bila bibe ji xewê rabûye û ji bo ku ji bîr neke, ew derbasî kasêtan kiriye. Mevlûdeke wî ya kurmancî heye ku ji bo kurdên Anatoliya Navîn hatiye nivîsîn. Wî bi xwe wesiyet kiriye ku ev berhemên kurdî piştî mirina wî bînin weşandin. Lê belê lêdan û zordestiyên asimilasyonê rê nedane ku ev berhemên Mele Rehîm bi zimanê dayîka wî bînin weşandin. Çawa tê dîtin çend dîvanên wî bi zimanê tirkî wek pirtûk di demên cihê-cihê de çap bûne. Di destpêka Mevlûda xwe de daye kivşê ku wî ev berhema xwe bi destûra Xwedê kurdî xwendiyê ku mirovên kurdîxêf jê behrekê girêbidin û jê feydekê bibînin. Mevlûda wî ya kurdî waha destpê dîke:

Xwedê Tu li hewan, li erdê tek e
Îşî ku Tu çêdike kes şenake

Însên çêdike Tu li damlek av
Rih didiye, gozel şexis, biri, çav

Eyni navek, insan çeşid çeşid e
Aqil qe nagihê Ya Rebbi îşî Te

Tili, jiniyê insên qirme qirme
Biri ser çava ra, te bê qê sirme

Şexsi wan Te çêkiriye ta ezel
Îşki Te abes tine, giştiki gozel

Ferq dîke gêrê, şev lêdixê izê
Xişirtiyê wê gêrê Tu dibizê

Tu mezinê Padişê Padişan e
Xaliqê tamamê va îşan e

Xwedê Tu ewwel e, Tu him axir e
Însan vê nafikire, qelbi kwir e

Xwarin Te tine, ne nan e, ne av e
Tu li kesi nebû, ne dê ye, ne bav e

Belli nine, ne Te mal e, ne şûn e
Haşa ne Te ewlad e, ne Te jin e

Tu bêheval e, tinine kesi Te
Mîna tiştîki nine him ew şexsi Te

Çunki " Qulhuwallah" şahidê Te ye
Butun va insan bangke,
Tu li rev wan heye

Duayên xwe kiriye kurdî, wek mîsal:
.....

Ewladî xêr bide, him bike alim
Bi ilmi Xwe amilke, meke zalim

Ba bizane ew zerarê xwe û karê
Meke berdûş, ba ew nemine li arê

Meke muxtac, Tu bide ê xêr li mal
Nesibke Ya Rebbi Tu loqmê helal

Mele Rehîm di cotrêzên xwe de hertim babeta dîn bi kar dîne, lê belê bi zimanê kurdî. Divê ez li vir tiştêkî din jî dîyar bikim ku ronakbîrên me gelek caran mele û şêxên me wek xayîn û paşverû îlan kirine, ev yeka ne rast e. Wek mîsal gelek mezinên kurdan, ji nav dîndarên wan derketine: Melayê Ciziri, Ahmedê Xanê, Feqiyê Teyran, Molla Ubeydullah, Şeyh Said, Saidi Kurdi....

Mele Rehîm di hin berhemên xwe de li ber xwe de digere û ji Xwedê hin tiştan daxwaz dike:

Ket qelbi min disa doxuşa Xwedê
Ezîk te ra vekime munacetê
Me bir meke wê riyê qiyametê
Xwe me gine ya Muhammed Mustefa

Tirsa min giştîk li ser mexşer e
Wê riyê imdadê me tu zû were
Hêline bin golgê, mêline der e
Ber wê germê ya Muhammed Mustefa

CEJNA QURBANÊ

Navberê Merwê û Sefê êştâ
Ew dera li mîslimana ra bû qible êştâ
Mehekê şunva teva bû av û tiştâ
Xwedê şukur Te Xwe disa da piştâ

Xwedê her karekî Te hikmet û sîrr e
Te kêrê ra got " zinhar nebirre"
Top hev bûn li wir maxluqatê qîrr e
Gotn " Xwedê çarekê îsmêil binêre"

Xwedê Te şenahiyeke peyda kir li wê navberê
Îbrahîm dihat ziyaretê salê carê
Rokê ew xwestibû ji Hacerê
Bir li Arafatê da bin kêrê

Xwedê Te Cebraîl ra got " zû ke rabe ser xwe
Here di Cennetê da beranekî derxe
Eceleke bide ber xwe
Îsmêil ji bin kêrê derxe

Hemû melaiket tev hatin sêrê
Tewr îmtîhan dîkîrin ji bo sebrê
Got "bavo piyê'm grê nede bî bend û kindrê"
Got "ezi razîme bi vê qederê"

Jor da daket Cebraîlî ekber
Bi tekbirê hat da xeber
Dîlşa kîrin her du Pêxember
Ji Xwedê ra secde kirin beramber

Berhema Mele A. Rehîm

Pêxember Yusuf

Xwedê Te Yaqîb li dinê pirr girî kirye
Te Yûsif li ber wenda kirye
Te Ezrêl re emir kirye
Bê min rihê Yûsif qetl nekire
Lê re meraqek peyda kirye

Yûsif xewnek xwe dîtîbû wê şevê
Lê re secde kirin roj, sitêrkan û hîvê
Sibê de rabû hat ba bavê
Bavê go vê xewnê xwe veşêrîne gavê

Biran rokê Yûsif bi xwe re birin qirr e
Hatîn gotin li me peyda bû gûrekî pirr e
Kiras sor kirin bi xwîna kêvir e
Gotin bavo gûran xwariye ca li kirês binêre
Yêqîb got madem gûran xwariye çima qe kirasi xwe nadire

Xwedê Te avêt qelbê bira
Herin bibên me Yûsifê te da gûra
Gûrê çarmandorê hatin wira
Gotin welleh me Yûsif nexwar a

Çend rojan şunva va xewna biran bîhîsta
Mel'ûn şeytan li navberê leyîsta
Salên xwe nebûn panzdeh û bista
Biran Yûsif avêtin birê qe kesî nebîhîsta

Biran Yûsif kirin bîrê
Bazirganî derbas dibûn wê dorê
J'xwe re hêlandin birin Mîsrê
Te heft salan li wir kir masarê

Xwedê te got bila Yûsif dûr here Yaqîb nebîhîse
Te li Mîsrê firotin da, dîsa biha ûcîz e
Xwedê îqê ew cînsekî pirr temîz e
Te kir xizmetkarê Zalîxa ezîz e

Berhema Mele A.Rehim

”...Kurd timê bi zimanê xwe li pê mane”



Giyasettîn Emre (li milê çepê) û hevalê xwe Emîn Beg di girtîgeha *Yassıadayê*


Piştî ku Demokrat Partî hate ser text hinekî firehî çêbû, pir kêr be jî serbestî hat. Gel bêtir ji kesên diçûne medresan hez dikir. Ewên ji ber henû qedexebûnan, medrese li ser piyan hiştibûn, gel ji wan jî hez dikir. Heta dema desthiltiya Demokrat Partiyê tu serbestî tunebû.

Paşê ji hin malbatên kurdan çend kes ketine parlamentoyê. Yek ji wan jî ez bûm. Yên din Şêx Selahaddîn, Xalis Evdilmecîd, Qasimê Mala Kufrevî...Tiştî herî balkêş ewe bû ku di dîroka Koma Tirkîyê de ez kesê yekemîn bûm ku wek parlementerê serbixwe ketime parlamentoyê. Paşê birayê min Qasim Emre jî du cara

wek parlementer hate hilbijartin. Pey re di hemû deman de gelek kurd ketine parlamentoyê. Dema ku kurdan di parlamentoyê de û derdorê parlamentoyê de bi kurdî diaxifîn, dewlet li wan hate xezebe, zimanê kurdî qedexe kir.

Li gel van qedexekirinan, qedexeyên her giran ya li ser medresa û hucreyên kurdan bûn. Lê belê medresa û hucran bi giştî dest ji ber van qedekirinan daneynîn. Ji bin ve xebatên xwe meşandin. Loma jî zaniyariya kurdan, dîroka kurdan, zimanên û edebiyata wan bi temamî bi riya medreseyan ser piya ma. Di vî warî de sê rêxistinên roleke mezin lîstîye: medrese,

Mezinê malbata Giyasettîn Emre
Şêx Mihemmed Dîyadîn ji Norşînê



dîwan û tekya. Di medresan de mirov hînî zaniyarî, dîrok, edebiyat, felsefe, matematîk, kimayê dibû. Di dîwanan de li ser mêrxasî, egîtî, qehremanî, merdîtî, nandarî û gelek babetên mayîn dihate sekinîn. Van dîwanan rêçeke însanî û netewî şopandine. Di tekyan de mirov hînî ehlak û edeb dibû. Torenasî, orf û eded dihatin nasîn.

Eget ev rêxistin tune bûne, wek gelek medeniyetên din li Rohilata Navîn, kurdê jî wunda bûna, biçûna. Divê ev rastiya neyêji bîr kirin. Li cîhanê şaristaniyên here kevnare, li Mezopotamyê hatine saz kirin. Ji wan gelek îro tunin. Eger kurd îro hene, ew jî ber hebûna medresan, dîwan û tekya ye. Di avakirina medeniyet û sîteyan (şehirdevlet) de kurdan roleke mezin lîstîye.

Dagirkeran timê xwastiye zimanê kurdî jî holê rakin, lê belê bi ser neketine. Kurdan gelek tişt bi saya jibergirtinê (ezberki-

rin) xelas kirine û gihandine nifşên îroyîn. Di dîwanan de bi edebiyata devkî dihate pêşkêş kirin. Ji bavan heta bavan vê yekê berdewam kiriye.

Kurd ji pera (neqd) gelek hez dikin. Lê belê bi peran jî ev gela jî holê nehatiye rakirin. Zorbetî li kurdan kirine, ew kuştine û koçber kirine. Lê belê kurd timê bi zimanê xwe li pê mane.

Neteweyekî ku dîroka xwe nizanine nikare pêşta here. Bi înkâr û redkirinê ve mirov nikare here cîhekî. Ya giring daxwaza wî ye, şaxsiyeta wî ye û baweriya wî ya bi xwe ye.

Bi rastî zane, edîb, şairên kurdan gelek berhemên giranbiha anîne holê. Gelek pirtûk nivîsîne. Lê belê dema her serobinobûnê de, ev pirtûk û dîwan ketine tendûran, bixêriyê û kuçikan, mirovan ew şewitandine, an jî di binê axê de rizyane.

Serpêhatiya melekî Kurdistanê û kurdên Anatoliya navîn wek keşfa Kristof Kolombê Amerikî ye

Piştî inqîlaba 1960 xwendina medresan li Kurdistanê hate qedexekirin. Xwendina min gihabû ber xelaskirinê lê lazimbû ez hinekî din jî bixwînim. Mamostekî ji min re got ku mirov kare bi serbestî li bajarê Konya bixwîne. Wî behsa mele Evdîl-mecîdê birayê Bedûzeman ji min re kir. Wê wextê ew li Konyayê bû. Kurdên Anatoliya navî û yên Kurdistanê baş hev nas-nedikirin. Wê wextê dinya mezin bû. Otepos pir kêr bûn. Bes trêna tenê ji Kurdistanê diçû Anatoliya navî. Yên ku dibûn leşker pê diçûn. Xelkê Kurdistanê jibo karê pambu diçûn Edenê. Xelkê Kurdistanê wek îro jibo kar û xebatê nedîçûn Anqera, Izmir û Konya. Bes kesê ku diçûne leşkeriyê, ew diçûn wan bajarên mezin. Kesî ji Kurdistanê nizanibû ku kurd li Anatoliya navî hene.

Wan jî nizanibûn ku hewqas kurd li Kurdistanê hene û wan goman dikir ku kurd ew tenê ne. Bes kesê ku ji kurdên Anatoliya navî dibûn cenderme û diçûn Kurdistanê zanibûn. Lê wextê wan ji gundiyan xwe re ew yek digotin, ji wan re pir xerîb dihat û gelek bawer nedikirin.

Rojekê min bilêta trêna birî û berê xwe da Konyayê. Dem serê nîsanê bû. Trêna me bi hêdî diçû û li gelek cihan dihat guherin. Li Kurdistanê bûbû bihar lê hê li Sêwaz û gelek cihên din berf û baran

pêkve dibariya. Piştî du şev û du rojan trêna giha bajarê Konyayê. Ez li stasyonê peya bûm. Dinya sar bû û bayê xerbî dihat. Ji stasyonê heta nawenda bajarê çend texsiyên şaworlêt, çend payton û gelek erebên hespa xelk dibirin. Ez li erbeke hespan siwar bûm. Heta ku tije nebûne erebe nedîçû. Xwediyê erebê li min meyzekir û bi tirkî ji min pirsî:

–Gelo hûn ji kîderê ne?

Min baş bi tirkî nizanibû. Wî famkir ku ez kurd im û bi kurdî got:

–Tu kurd î?

Min got:

–Belê.

Wî bixêrhatin di min da û kêfa xwe ji min re anî. Piştî erebe tije bû, em çûne nawenda bajarê, nik mizgefta Ezîziyê. Hinek kes li wir boyax dikirin, tiştên kevin difrotin û zilamekî jî pirtûkên olî difrotin. Ez çûme nik zilamê ku pirtûk difrotin. Teva bi kurdî xeber didan. Min silav li zilamê pirtukfiroş kir.

Wî fam kir ku ez kurd im. Wî bixêrhatin di min da, kursiyek danî û xwest ku ez runê. Ez pir kêfxweş bûm. Zilam çû ji min re çayê anî. Wî ji min pirs kir:

–Gelo hûn xelkê kîderê ne?

Min serpêhatiya xwe û sebebê hatina Konyayê jê re got. Sihbeta me dirêj bû. Min xwest ku ez herim lê wî got:

heftekê diman û dîsa diçûn. Xwendina min li nik mele Evdilmecîd gihabû ber dawî. Mele Evdilmecîd xwest ku Mûsa Bezercî ji min re gundekî bibîne û ez dest bi meletiyê bikim. Mûsa namek ji malx-ezûrên xwe re nivîsand û ez çûme Yenî-cobê. Osman Bêkar pir kêfa xwe ji min re anî lê got:

–Mixabin, me berî sê rojan melek girtiye û wî mala xwe aniye. Lê wî namek ji miftiyê Kulu re nivîsand û xwest ku ew min li gundekî bike mele. Kulu qeza bû lê jê re digotin "Kulekoy". Xaniyê wê hemû kerpîç bûn û mêvanxane (otêl) û xwarinxane (lokanta) lê tunebûn. Xelkê gundan ku dihatin Kulekoy, dibûn mêvanên nasên xwe. Doktor û xestexane jî lê tunebûn. Xelk li erebên hespan siwar dibûn. Bes texsiyeke kevin hebû û navê xwediyê wê Gincî bû. Ez çûme miftîxanê û min name Osman Bêkar da miftî. Wî ji min re pir hîrmet kir û got:

–Ezê te bişînim gundekî kurdên Şêxbiziniyan û mezhebê wan jî Şafî ye. Wî namek nivîsand û ez rêkirim Canomanê. Li Canomanê ez bûm mêvanê Memoyê Hecîkeko. Wî pir rêz û hîrmet ji min re dan nîşandan lê melê wan jî hebû. Me şeva xwe pêkve bihurand. Serê sibê ez û ew li du hespan siwar bûn û çûne gundê Dîpdedê. Gund di newaleke kûr û ber Qerecedaxê de bû. Em çûna mala mezinê gund, Haşim axa û me serpêhatî jê re got. Wî bi dilekî vekirî û rihekî paqij em pêşwazî kirin. Hê berx baş gir nebûbûn lê wî ji me re berxek serjêkir. Sifra xwarina wan ji min re pir xerîb hat. Xwarin ne li ber çav bû. Wan pêşî şorba terxanê anîn. Min goman dikir ku xwarina me ew tenê ye. Lê dawî goşt, birinc û gelek tiştên din hatin ber me. Ji ber ku min nizanibû, min zikê xwe ji şorbê dagirt. Êvarî gundî hatin civata me.

Hemû bi zimanê xwe yê teyîbetî, Şêxbiziniyê, mijûl dibûn. Ez hê hivde salî bûm û wan goman dikir ku ez nikarim meletiyê bikim. Melekî wan bi navê "Hecî Ehmed" hebû û ew jî hatibû mala Haşim axa. Hecî Ehmed di derheqê mezhebê Şafî de çend pirs ji min kirin. Min bersiva wî da û min pirtukeke şerîatê ji turikê xwe derxist û xwest ku ew hinekî jê bixwîne lê mixabin wî nikarbû. Gundiyar biryar dan ku ez bibim melê wan û wan dê salê çar sed teneke genim bidane min.

Ez bûm melê gundê Dîpdedê. Gund wek gundekî Colemêrkê û Şirmexê bê mekteb bû. Riya makîne nehatibû gund. Westê hinek diçûne bajêr, ew sê saetan dimeşiyar heta ku digihan ber cada makîne. Jiyan di rewşeke xwezahî de bû. Ziman û bazara bajariyê neketibû nav gundan. Westê jin zarû dibûn jinên xwedî tecrûbe ji wan re pîrikî dikirin. Doktorên wan wek yên Kurdistanê hekîmên kurdî bûn. Dest û lingên şikesî hekîmên wan çêdikirin. Gelek kesan xelk dixapandin, nivîşt ji wan re çêkirin, devgirêdan dikirin, cinên wan digirtin û ezîme ji wan re vedikirin. Yê ku ew tişt çêdikirin pir zengîn dibûn. Çopir Hiso, Elî Çawîş û Sadiq efendî ew kar dikirin. Wek xelkê Kurdistanê kes ji wan gundan ji bo kar nedîçû Anqerê. Carna hinek jibo nexweşînan giran diçûn. Xelkê gundan ji sedî nofî bajarê Anqerê nedîtibû.

Piraniya xelkê gund bi tirkî nizanibûn. Jinan kincên dewra berê li xwe dikirin. Hemû bi dehrî û xeftan bûn û kumên bi rêşî li serê wan bûn. Dora kumê wan hemû zincîr, çerxî, mecîdî û qurîşên zîvîbûn. Êşlikên wan qedîfê zerbelek bûn. Du bendî, dijminî û xisumat di nav wan de pir bûn. Gelek cara wan ji bo tiştêkî bê sebeb hev dikuştin. Qerektêrê wan ji yê tirkên derdora wan cuda bû lê wek yê

gelê Kurdistanê bû. Wextê nexweşiyek di nav gundekî tirk û kurd de çêdibû, kurd hemû yekdest dibûn. Kesî zû bi zû jin nedida tirkan û ji wan nedizewicî.

Şêxbiziniyan melê xwe wek dîkî şerê dibirin gundên din û ew berdidan hev.

Wan dixwestin ku herroj li gundekî teaziyeke an dawetek çêbibe, ew min bibin jibo ku ez û melê wan nîqaş bikin. Jiber ku min ilmê erebî pir xwendibû û melên wan bi piranî lazên derya reşbûn, xwendina erebî nexwendibûn, min zora wan dibir. Gundiyên min û gundiyên din jibo nîqaşa me, melan, şer dikirin. Berî min jî melek li nav Şêxbiziniyan bû. Ew ji Kerkukê hatibû. Kesî zora wî nedibir. Xelkê navê wî kiribûn melê *qorukkesan*. Ew çûbû rehmetê. Wan êdî navê min kirin *qorukkesanên duyemîn*.

Şêxbiziniyan ez birim gelek gundan. Em çûne, Altinlerê, Bêşkerdêşê, Tewşançalî, Qerekilîsê, Dîqulaxê, Yeraşlî, Mandra, Xelka, Degirmanozû û gelek gundên din. Êdî gundiyên min diçûn kîderê serpêhatiya min û melên din danîn ziman. Ez ji wan re bûbûn wek dîkê şer. Ez ketibûm nav meselê.

Şer û niv şer bûbûn yek.

Li her gundekî Şêxbiziniyan çend dizên navdar hebûn. Pişe (sanatê) herî

mezin li wan gundan şivanî bû. Kesê ku du salan dibû şivan, ew dibû xwediyê keriyek pez. Xelkê wan gundan feqîr bûn lê dilzengîn bûn. Hatina wan li ser cot û heywanan bû. Deriyê her kesî jibo mêvanan vekiribû. Her malekê leqebeke wê hebû. Mala Holka, Qajman, Çopir, Hirç, Diro, Sêwî, Qîro, Dûvelik û Serkevir.

Çend çavvekiriyên Kulekoyê hebûn, wan tişt bi perekî zêde û bi qer didan gundiyên kurdan û havînî ji dêlva pera genim ji ser benderê dibirin.

Hesinker, kurtanker, qeraş (aşvanî) û çerçî ji tirkan bûn. Dora gundên tirkan hemû bax û bîstan bûn lê yên kurdan rût û rical bûn.

Belê heta hinga kesî ji herêma me nizanibû ku hewqş kurd li Anatoliya navî hene. Bi rastî piştî sala 1960 ku ez çûm, min ew dîtî, serpêhatiya Kristof Kolomb hate bîra min. Wek xelkê Amerika û İspaniya yên Kurdistanê û Anatoliya navî hev nasnedikirin. Belkî ev yek ji gelek kesan re xerîb were lê yê ku terzê wê idîa bike, bila bêje na. Silav li hemû kurdên Anatoliya navî. ■

Îd û sersala we ya nû
pîroz be!

Redeksiyona Bîrnebûnê

Em zarok bûn bûne bûk!

Li Anatoliya Navîn gelek jin hene ku di zaroktiya xwe de mêr kirine. Piraniya wan ne bi dilê xwe, bi raya dê û bavên xwe çûne mêr. Bi rastî wan mêr nekiriye, ew dane mêr. Gelek ji wan di 12-13 saliya xwe de mêr kirine. Li jêr ji wan jinên kurd pênc kes behsa serpêhatiya xwe dikin. Di van hevpeyvînan de jîyana wan ya Swêdê û ya li welêt tê vegotin.

Elife Koç

Navê min El e, ez ji gundê Hecîlera me. Ez li Hecîlera mezin bûme. Navê bavê min, Xelîl Baran e, navê diya min Gulîzer e. Em pênc xwang û bira bûn. Paşê em çûne gundê Bordelikê (Tatara). Ev gund gundekî tatara bû, bi Cihanbeylîyê ve girêdayîye. Em gelek salan li Ankarê man, paşê em hatin Swêdê. Berî ku em bîn Swêdê em salekê li Danimarkayê man. Li wir mafê rûniştandin û karkirinê nedan me. Me tu rêk nedît, em hatin Swêdê. Ev 27 sal in mêrê min miriye,



pênc zarokên min hene. Zarokên min niha hemû mezin bûne, malên wan hene. Ez niha tenê li taxa Fittjyê dimînim. Min xwandina xwe xelas nekir. Ez carina diçim newiyên xwe dibînim. Rojên me di nav çar diwaran de derbas dibin. Qasî 20 newiyên min hene. Dema ez teze hatibûm min pir kes nas nedikirin, lê belê niha hin

nas û dostên me hene, dorberên me fireh bûn. Ez him welêt hez dikim, him jî Swêdê. Gelek mirovên me li Ankarê dimînin. Ez carina ji bo tetilê diçim Hecîlera, nas û pizmamên xwe zîyaret dikim. Ez li Hecîlera hatime dinê, li Bordelikê mezin bûme. Paşê bûme bûka Bûmsizê. Paşê salên me li Danimarka û li Swêdê derbas bûne.

Di 12 saliya xwe de ez dame mêr. Dema ez bûk bûm, min mêrê xwe,

dergistiye xwe tu nedît. Roja ku ez siyar kirim, wê demê min mêrê xwe cara pêşîn nas kir. Ez zarok bûm. Li gundê tatarên de mam, hevalên min zarokên tatarên bûn. Di vê gundî de tenê çar-pênc malbatên kurd hebûn, yê din hemû tatar bûn. Ji ber ku em li vî gundî xerîb bûn, diya min zêde ez bernedidam derva. Min ne zaroktîke baş, ne jî cîwanî û dergistîke baş derbas kir. Ez di 16 saliya xwe de bûme dayik. ■

Zeynep Tümtürk

Ez bi xwe ji gundê Omê me (Gordoxlî). Navê dayika min Eyšê ye. Bavê min tune bû, ew çibû rehmeta Xwedê. Di 13 saliya xwe de ez dame mêr. Ez bûme bûka gundê Celebê. Ne xebera diya min, ne jî xebera min ji vê yekê hebû. Pizmamên min yê ku li gundê Bulduk diman, wan bi serê xwe biryar dabûn. Salek derbas bû, mirovek hat, got ku "Zewê dergistiye te hatiye! Ham hatiye te bibîne". Min derva kinc dişûştin, xebera min li hatina wî tune bû. Min xwe şaş kir, nizanibû çi bikira. Ji bo vê yekê ez nexwaş ketim. Wê şevê min ji tirsê ew qebûl nekir. Wan da rê, çûn. Dergistiye min careke din dîsa



hat, wê carê jî ez tirsiyam. Ez zarok bûm. Di 16 saliya xwe de ez bûme bûk. Xezûrê min pir bi eseb bû. Xasiya min gelek jê ditirsiya, nizabibû çi bikira. Dema hêrsa wî ji xasiya min dihat, ez diketime navbera wan û her tişt min hildida ser xwe. Wê demê hîrsa wî perçekî dadiket.

Min nexwand, ez tenê çûme sinifa yekemîn. Mamosteyê me yekî xerîb bû. Gundiyên me li wî xistin, ew revî çû. Paşê yekî din hat, ji bo wî gotin ku "ew dîn e".


Ez pir tirsiyam. Di wan salan de pir maqûl nedidîtîn ku keç herin medresê

Mêrê min qerewêlî (bekçîtî) dikir. Paşê got “ezê herim Swêdê, ji xwe re hinek pere berev bikim, motorekê bistînim û paşê vegerim”. Di sala 1966’an de çû Swêdê. Du salan şunda hate îznê. Çar zarokên min hebûn, ez bi wan re tevayî dijiyam. Mêrê min qasî 70 hezar kron bi xwe re ji Swêdê anîbû, ewqas pere jî wê demê ji zeviyên me qezenc hatibû. Min got ji me re li bajarê Qonyayê qate xanî bistîne, em bi zarokan ve tê de bimînin. Wê demê qate xanî qasî 90-120 hezaran bûn. Lê belê mêrê min got “na, ezê motorê bistînim, bila birayên min pê rençberiyê bikin”. Di dawiyê de motorek stand. Di destpêkê de digot: ”Eger ez

Zewê bibim Swêdê, êdî ew ê li wir bimîne, careke din venagera”. Min ji re got ku: ”Ya tu ê min bibî Swêdê an jî tu ê ji Swêdê bêyî vir!”. Gelek sal derbas bûn. Em di sala 1982’an de hatine Swêdê. Swêd cîhekî gelek cuda bû, wek Qonyayê nîn bû. Keçên 14-15 salî, êvaran tenê li derva heta derengiyên diman. Lê belê li Qonyayê hevalên wan di hembêza diya xwe de ji zûda raketine, ketine xewa kûr. Ev yeka ji min re pir ecêp hat. Berê li Swêdê qimetekî me hebû, niha tiştêk nemaye. Ez carina diçime Qonyayê. Min xanî li wir çêkirine û bi dilê xwe raxistiye. Xazila min ev xaniyan di salên ciwaniya xwe de bidîtina, em niha pîr bûne, çira mal û xanî. Salên keçitiyê û ciwaniyê ji destê me çûn ■

Eyşe Keçeci

Ez ji Haymanayê, gundê Sazê me. Navê min Eyşe Keçeci ye. Ev gund gundekî Şêxbizninan e. Di 13 saliya xwe de ez dame merekî bî ku jina wî berî çend salan miribû. Mêrê min ji Incowê bû. Em qasî 50 salan li Incowê man. Mêrê min belengaz û xizan bû. Karê wî tune bû. Vê yekê hêrsa wî dianî. Berê digotin ku:




“Mêrê mên jina xwe dixê”. Niha jî mên ji jinên xwe ditirsîn. Xazila em niha bihatana dinyayê. Min ew nas nedikir. Sêwiyên wî hebûn. Ez ji wan ne pir

mezintir bûm. Lê belê min ji wan hez dikir. Dema hêrsa mêrê min ji zarokan dihat, wî jî dianî min dixist. Mêrê min berî bîst û şeş salan miriye. Piştî mirinê zarokên min çûn leşkeriya xwe kirin. Paşê hatine Swêdê. Heft sal in, ez li Swêdê me.

Ez li vir bal kur û bûka xwe dimînim. Mala wan li taxa Flemningbergê ye. Xerîbî pir zehmet e. Ez çûme medresê, hinekî zimanê swêdî hîn bûm. Paşê ez bi çavan emeliyat bûm. Niha kar nakim, li malê me, cîranên me hemû ji gunê me ne, nas in.■

Şaîze Parlak

Navê min Şaîze ye, ji gundê Omê me û bûka gundê Celebê me. Di 14 saliya xwe de ez dergistî bûm, di 15 saliya xwe de min mêr kir. Piştî mehekê di sala 1976'an de ez hatim Swêdê. Di 16 saliya xwe de ez bûme dayik. Wexta ez Swêdê bûm, min ji gundê xwe bêtir qet tu cîhek, qûlek nedît. Dema ez teze hatim, gelek kêfa min ji Swêdê re dihat. Lê belê me ziman nizanibû, em li vir xerîb bûn. Heval tune bûn, cîran tune bûn, kes tune bû. Millet (mêrê min) diçû iş, ez tenê dimam. Min bi seetan rêya mêrê xwe dipa. Roja îne dengê serxoşên swêdiyan dihat, min fam nedikir, min heb zanibû mele dixwîne û min digot: "ezîzellah!"...Wan salan li Swêdê hinar, zebeş û fikêyên mayin tune bûn. Em niha bi kasan distînin. Carekê heval hatine malê, gotine min: "me ji te re tişteki aniye". Min mêze kir ku wan ji min re hinarek anîne, ez gelek kêfxwaş bûm. Wê çaxê me tu tişt ji derva nedistend, me



digot ew malên "gawiran" e. Wê çaxê em pir kes nîn bûn ku diçûne medresê li Swêdê. Me sifte nizanibû ku medrese hene, paşê em çûne sinifekê ku Henefî Celeplî mamosyetê me bû, wî kurmançî ber me xist. Em çûn zimanê kurdî hîn bûn. Li wê derê Henefî Celeplî behsa Kurdistanê kir, me nizanibû Kurdistan li kîderê ye. Min rojekê ji Henefî pirsî, min got "Henefî Kurdsitan çi ye?" Paşê em hîn bûn ku her kes divê 4-5 mehan here ziman hîn bibe. Piştîkî ku min ziman qedand, ez çûme medresa memurtyê (kontorutbildning). Min çend salan li belediya Huddingê kar kir. Me li gundê Celebê duqat xanî çêkirine, em carcar havîne diçine îznê ■

Fatma Ateş

Ez ji gundê Omê me. Di sala 1935'an de hatime dinê. Wexta ez şeş salî bûm, min bavê xwe wunda kir. Birakî min tenê hebû, salên wî 9 bûn. Hemû karên der û hundir diya min dikir. Ev yeka ji wê re giran dihat. Paşê diya min bi nasekî me re mêr kir. Ji vî mêrkê din keçekê bû. Min wek xûşka xwe lê hez dikir. Di sala 1945'an de, mêrek hate xazginiyê min. Jina wî teze miribû, bêjin bû. Diya min ez nedamê û got ku: "keça min hê piçûk e". Ew ji min gelek mezintir bû. Lê belê wî ez xistibûm hişê xwe û dixwast min rakşîne û bi min re bizewice. Ez ji tirsra diçûme mala xalê xwe, li wir radizam. Wî, jineke cînar dişand ku bizanibe ka ez li kîderê me û çi dikim. Ez kontrol dikirim ji bo ku di demeke misaît de min rakşîne. Ez gelek ditirsyam. Şevêkê bi dizîkava hate mala me, ji pencera kadîne kete hundir jo bo min birevînin. Bi pênc kesan ve hatibû. Hemû mêr bûn. Dema wan derî şkestandin û ew ketine hundir, ji birayê min re gotin ku: "Keçik nedan yeke çi ne? Em ê bi darê zorê birevînin". Şev bû. Ez revîm çûm ketime nav nîvînên diya xwe. Ew raketibû. Carekê de hişyar



dibe, nizane çi qewimiye, şeverêş bûye. Wê heb zanibû ku yekî xerîb hatiye û nigên wê girê dide. Ew jî gelek tirsiya. Birayê min dijî vê yekê derket û cilên wan kişand, berneda. Wan jî tebenca xwe kişandin, carekê gule berdan hewayê ji bo ku çavên wan bitirsînin. Salên min deh sêse bûn. Xûşka min wê şevê ketibû nav cîhê min. Wan nizanibûn ku ez li kîderê me. Wan bi xeletî û şaşî xûşka min ravandin. Devê wê girtibûn. Dema mêze dikin ku diranên wê ketine, ew fam dikin ku wan şaşîk kiriye, yeke din revandine. Paşê wê berdidin. Wê demê cîran û nasên me hişyar dibin, tên hewariya me. Piştî demekê me ew dane mehkemê. Ew di di bin çavan de man. Qasî du mehan ceza dane. Paşê ew hatin xazginyê min. Qelendê min birîn, 40 kavir, hespek, gayek û mangek bi golikekê ve dane diya min. Diya min jî ez dame wî ■

GURÊ HAR

Ew çiyayê te, va çiyayê min sê mehan Hemê; payîzeke direj, li deşt û banîya derbaskir. Negot şev negot ro, keriyê pêz; keriyê Osman Begê çîya bi çîya, gund bi gund, delav bi delav çêrand. Roj bûn, tî û birçî ma. Lê, pezê xwe rokê bê xwê, bê av û bê çêre nehişt. Neyê qole wû. Dewara dinê yê bi qar wû. Li mal, dayîkek pîr, jina xwe û çar kurik li benda qezenca wî wûn.

Wê wextê, nanê di devê şêrande wû. Axayê wî Osman Beg jî, axakî zilimdar û zordest wû. Hemê rind dizanî, axa kêmayîyeke wî biwine, ê biqewitîne. Yê bê kar bimê û malbata wî wê pêrişan biwe. Axe, bi şivanîya wî qaîl nebe; ê rê bi berde û ê bê av û bê nan bimê. Osman Begê, şivanê xwe, yê dibêr Hemê, ji netuyî, kinç, şal, û meras ji ninga kiribûn, ew xwas û tazî, başhevala bi nav gund de şandibû mal.

Hemê, payîz rind derbas kiri wû. Tu pez nehate dizandinê, tu pez nemiri bû. Tu nerindi nehatibûne serê wî. Êdî serma dest pêkiri wû. Hêdî hêdî xwe ji çûyîna gund re amade dikir. Çar mî yên xwe jî dinav keriyê êxe da wûn. Du mî ji wana, firotin gundê ku lê pez diçêrandî. Ku bi wan perana zivistanê, tenakî din rehet derbaske.

Şeveke sar, şili keti wû erdê. Hemê, pez li dawîya çiyê, li navbera zinara mexel kir.

Bizbenda xwe girêda û kete nav kulavê xwe raket. Nivê şevê, mîya belek xwe rakişand û bi benê bizbendê, Hem bi xûr re kişand, ew ji xevê rakir.

Rabû ku, kuçikê lédikevine û pezî şeqe bi şeqe bûyê. Mala gura bişewite, ne belengazî ya Hemê, ne jî zordestîya Osman Begê dizanîn. Du mî, ji nav pêz girtin û birin. Ne xema gura wû, ku Hem kirin bin kîjan barî giran û çûn.

Gura, tirsî Osman Begê kirin nav dilê Hemê û çûn. Osman Beg, ne axakî mîna axa wû. Ne yekî çav fere wû. Zalimekî bi serê xwe wû. Axa, pezê mirî, pezê com bûyî, pezê gurxwarî û pezê ku hatiya dizînê; ji heqê şivana nedigirtin. Ew yêka, ne yê ji erf û edetan wû. Lê dîsa jî Hem ditirsî, ne dizanî Osman Begê çi bike. Ew nezanîna bi serê xwe tirseke mezin wû.

Her ku çû, hukmê sermayê zedê dibû. Berfê jî, dest pêkiri wû. Hemê, keriyê xwe berhevkiş, berê xwe da gund here ser mala. Hate gund, bi du kêmayîya pez teslîmî Osman Begê kir. Ku Hemê got: Du pez gura xwarinî mîna ku har bû. Hîna nekir, ku gura du mî xwarin. Şivanekî ku ji Hemê hez nake xeber dabû Osman Begê, gotiwû; Hemê du mî yên te firotin. Hemê, çiqas li berxwe dayîbe jî, Osman Beg îqna nekir. Osman Begê ew, diz û derewin kiriwû.

Hem, di roke sar û bi berf de, kete rê û çû gundê ew herdu mîyana firofî. Hal û hekata xwe û zilma Osman Begê kirî, ji wan re kat kir, perê wana vegerandin û mîyên xwe; yek li ser kerê da ber xwe, yek jî da kola xwe û kete rê. Vegeriya gund. Hemê rê bi nîvi kir, hate navbera her du gundan, du gur lê pêyda bûn. Her yekî ji kêlekeke Hemê de; gurên birçî, yekî ji vir da yekî ji wir de Hem pêrişan kirin. Gur, rastî nanê xwe hatibûn. Tu hale ya ku Hem têda neyîbûn. Hemê, canê xwe kiriwû devê xwe û miriniya xwe dayîbû pêş çavên xwe, bi çoyekî şivana gur ji ser xwe qorî dikirin û li ber xwe dida. Hem bi gurên çolê re ketibû şerekî mezin. Şaş mayîbû; xwe û mîyên xwe, çîng ji dest gurên çolê, gurên birçî xilas bike. Qirara seetekê, bi şivekê gur ji ser xwe neyî alkirin û xwe parast. Hemê negot gurên zivistanê, gurên birçî yê min ji bixwinî. Ji bo ku Osman beg bizane ew neyî diz e û neyî derewin e, bi xwe û xwe ji gura re digot; Ez wana nadim we, ezê bi Osman Begê dimî û dest ji şer bersedida.

Hemê, çiqas liberxwe dayî be jî, bi gurên birçî re başnekir. Êdî westîya. Wê sermê da, di bin xuhyê va bûyîwû. Bê mecal keti bû. Lê tîrsa gurê li gund; tîrsa gurê har, tîrsa Osman Begê; vi ser tîrsa gurên çolê dayî bû. Lewma ji ya xwe nedima û dixwast ku bi ser gurên çolê

keve. Heme, wexta ku bi şîva xwe carek din li gurê pîyan rastê xist; gurê din devê xwe avita zikê mîya li ber vî û ew kişande erdê. Li herdê, carek din devê xwe avite mîyê hûr û pirtûkên wê li erdê kirin. Hemê bi mîya din ve xwe avita erdê û ew mîya dest gur de girt û ji dev vî kişand. Herdu mî girtin û carek din xwe avite ser kerê. Lê; dîsa nebû. Gurekî mîya din dev kir û ji dest girt. Hemê bi ser vê da omdîya xwe birî. Zanî ku gurên birçî, hetanî ew mîyekê nede wana, vî bernadin.

Mîya xwe yek ji guran re cihîşt, dest ji gura ber da. Hemê, mîya bi birîn li ber xwe bi zorê ji guran xilaskir û xwe gihande nava gund. Lê, Osman Begê va hekata hatî serê Hemê jî, hîna nekir. Hîna nekir gura mîyek ji dest Hemê girtin. Cotgarekî xwe û Hem li ereba hespa siwar kirin. Şandin şûna ku gura xwe berdayî Hemê. Hemê wana, çêrmê mîyê û çend perçeyek ji ber guran mayî, anîn avitin ber Osman Begê. Lê; Osman Begê, ji zilm û zordarîyê dest berneda. Dîsa jî got; "Wana ne mîyên min in. Ya mîyên min biwîne wûne, ya jî du mîya bide min."

Hemê, ji du mîyan yek ji dest gurên çolê girtibû. Lê, nikarî mîyên li mal ji dest gurê har, ji dev Osman Begê bigire. Nedizani, ji bo ku jîyana xwe bidomîne, hê çî û çend bedela bide gura ■

DU KILAMÊN DÎROKÎ

Ez îsal jî di meha heftan de ji bo îzna xwe ya salê çûme welêt. Gava ez berê xwe didime welêt, di dilê min de şabûneke bê sînor peyda dibe. Lê, li vegeerê dilê min zîz dibe. Ji bo ku ez zîzbûna dilê xwe hinekî kêmbikim, min devê xwe da eşîra Têrkan. Ez fikirîm ku ez ê belkî çend mikamê xalane xwe hildim kasetekê li xeribiyê guhdar bikim.

Ez bûme mêvanê meta Fîdan ku eslê xwe ji eşîra Têrkan e. Ji gundê Xabûrê, ji gundê Koseevdaliyê. Bi tirkî jê re dibêjin Yurbeyli. Meta Fîdan ji Şêxbiziniya mêr kiriye, 92 salî ye. Meta dayka min e. Piştî xêrhatina me, me jî metê re kavana dilê xwe vekir. Me mêze kir ku metê paşila xwe destmal derxist, dev û pozê xwe paqij kir. Paşê kitana serê xwe çêkir. Min di dilê xwe de got; meta me kovana dilê me derman dike. Li gor gotina dayka me ya hêja, kilama Mistefê ev nêzikî heftê sal in û kilama Gulê jî ev nêzikî bist sal in li vê heremê tê gotin.

Qerê Mistefa

*Mala Palancîya bişewite di cûkû teng de
Dulmatîkî li Dune deng da
Xeberdana xeber anî
Serê Qerê Mistefê di xuna sor de reng da
Lawno lawno, birano!
Li Palancîya palve dano!
Mîna marekî agî xwe dêr dano
Ji şeş eşkiqa yek nemao
Telê bi tenê telê bi tenê
Bavê Mehmet birê minê
Kî tirk ji mewziyan derdiketin
Digotin: Haydi gidelim!
Kara Mustafayê tartalim!
Te çi serê min de hêle hêle
Qol û qanatê kekê min
Nasekinin di nav herbê de*

Kê ecebê waha giran dî
Serê Qere Mistefe jêkirin
Şandin ba Kemêle
Dilê min tê laşê qalî malî
Parçek ewrê reşî tarî
Birao ne digurtya ne dibarî
Qere Mistefa nemiriye
Ketiye bêr xişma sed û pênce sîwarî.

GULÊ

Mal sêyrano mal sêyrano
Bi zorî çoyî xweo gûvano
Bê cîrano bêhevalo
Te qet negot male min
Bê aşîq bê kervano
Bivê bivê Gulê bivê
Gulê Gulê Gulqurbiyê
Here pêşiya deveciyê reşiya
Dibên kincê kekê te neşûştiye
Serê xwe yê kurnekiriyê
Dilê min bûye qela Hesnî
Organê min rabûne nasekinin
Seva xatrê mala dinê
Min Gula xwe ya delal avît bîra vê bînê
Va deveciyana cenge cenge
Ev eketiye zuxura tenge
Tu bi celebê gencan re şayî
Nê azar mayê nê sêr tenge
Zûke zûke Gulê zûke
Arkî dadê ji kekê xwe re
Ma bira dûkê
Kê ecebê hawa giran dît
Piştî Gula min gire nabû
Eyvah Gula min nekir bukê
De pêre pêre derwêş pêre
Ev çito pêre pê qevîre
Malek bû bîst û du sala.
Kî ji xwe re
Rûyê wî de xelkê biro.

Berhevkar: **Mistefa Kizilkaya**
Ji devê **Fîdana Elo**, ji gundê Xabûra.

Dîk û Ruvi

Dîk û ruvi raste hev tên. Ruvi ji dîk ra diwê ez ku te bixum.

Ew jî diwê tu isto (cito) min dixu, soda cumayi (în) ,ez soda limi (nemêj) yê cumê bikim dû ra min bixu.

Ruvi diwê bû. Siwe diwi, dîk difire ser darê, xu dide ser dêr. Ruvi ji wir tê, qame mêze diki, diwê; Ooo! Selamaleykum Xoruzi paspali!

Dik diwê; Ooo! Aleykumselam, Tilkî cambazi!

Ruvi diwê, *Aşağı inde kilalim Cuma namazi.*

Dik diwê *aşağıdan geliyor iki athyla bir tazi, onlar gelsin sonra kilalim Cuma namazi.*

Ku ruvi çito navi wana dibizi, bazdidi, ji vir direvi û dik xu ji devi wi xelasdiki.

Gur

Gur rokê birçi bû ye, digeri, digeri ji dur va kerik pez divine. Tere nezikê diwi ku ew kerik bizini. Bi yek va radihêli bizinikê. Bizin diwê; tu ki min bixu?

Gur diwê; erê.

Bizin diwê; ez herim karê xu bimijinim. Dû ra min bixu. Gur diwê erê.

Bizin çito xu ji devi gur xelas diki baz dide ji gur direvi.

Gur disa dikevi rê kerik pez diwini. Teri bi mi kê digrê. Mi diwê; Tu ki min bixu?

Gur diwê; erê.

Mi diwê; ez berxê xu bimijinim, pase min bixu.

Gur diwê; ere.

Mi çito xu ji devi gur xelas diki, bazdidi, direvi.

Gur icar tere ku hoza sêbirê, mina çolikê ku hespeki li wiri.

Hesp diwê; tu ki min bixu?

Gur diwê erê.

Hesp diwê; bi pas min keve di navi boçê min da xetik (kaxız) heyî,wê xetê derxi,dû ra min bixu.

Gur diwê; diwi.

Gur li pa dikevi ku çi bikevi, hesp-çito pinikê li eniyê gur dixini,gur li erdê dikevi û hesp didi tizika û direvi.

Gur li erdê dinali, pin li eniyê ketiyi. Û diwê;

Gittim buldum bir keçi.
Ne yapacaksın içi miçi
Ye de yanında yat.

Gittin buldun bir koyun,
Ne yapacaksın oyun moyun
Yede yanında yat.

Gittin buldun bir at
Ne yapacaksın xet û berat
Yede yanında yat.

SITILA MORMIRCAN

Çi hewuyi, çi tunewuyi, jinik û meriki va hewuni. Vana zaroye xu nediwuni. Rokê xadê ewladikî didi vana. Keçikike. Keçik mezin diwi, gir diwi. Rokê teri kaniyê ,avê. Kani nişkava vê ra tê zar,tê zar diwê; Sitila mormircan, sitila mormircan.

Way li te, way li te hin çiyê wari seri te!

Keçik ditirsi, nizani'çi biki. Lê dixî tê mal û bi diyê xu ra diwê. Diwe eyê; ez terim kaniyê, avê kani ji min ra hate zar û diwe ku;

- Sitila mormircan sitila mormircan

Way li te way li te,hin çiyê wari seri te!

Dê jî diwê ku cardin tu çû, jê bipirsi çiyê wari serî te. Keçik disa teri seri kaniyê, avê. Kani disa tê zar. Kecik diwê, çi diki wari serî min, tu yeji min ra biwê.

Kani diwê; Bake rawi, gilêleke rawi, talazike rawi, tu ye bi ber bê keve, tu ye heri ku kêsik tune, xanik heyê, deriyê vewu, tu ye têkevê.

Keçik tê disa bi diyê xu ra diwê.

Dê diwê; te negot ku ê kinga biwi?

Dê diwê cardin here.cardin teri.

Kani disa tê zar. Keçik diwe; e kinga biwi?

Diwê e niha biwi. Zeman tê ba , gilêle, evê reş,keçik dikevi ber. Keçik teri ku çolike, xanikî teneyî, deri şeq vediwi,keçik hoti zik diki,deri serda por diwi. Keçik mêzediki ku dî xênî da kesik tunni,mezelikî li vir i. ji vi mezeli bêtir kes tunni. Keçik xu ra li vir

dixu, vedixu dora mêzel pa diki, dora mêzel av diki. Li benda wi mezeli diseki. Zeman derbas diwi, rokê çiluska riyê biharê tê, di bin dêri da didi der. Keçik diwê ez deri wekim û eniyê xu bidim ro. Mêzediki ku zafranci radibrên. Safranci radibri, le keçikike qilêr û reş li doyê mayi. E reş diwê ez ji hevala mam. Ez warim bi tera biwim heval. Keçik diwê wari emma li vir ji min bêtir tu kes tunne yi. Diwê bira. Li hindê dimîni. Rokê du ro ya li wir dimîni ku mezeli radiwi, radiwi ku xortiki. Diwê kê xizmeta min kir?

Keçika reş hemen diwê ji min kir. Diwê kê dora min av kir? Ê reş diwê min kir. Diwê kê dora min pa kir? Diwê min kir.

Siwe ron diwi. Merik radiwi, diwê ez kim herim bajêr hûn ji min tiştikî dixwazin?

Keçikê reş diwêji min ra vê bîni,wê bîni,barik tişt jê dixwazi. Keçik jî diwê ji min ra kêrikê û bukikê va bîni. Merik bixu xu diwê di bin kêrê vê û bukê vê di tiştik heyî ya ,em binêrin ci heyî? Merik teri bajêr,tiştî ê reş gi dikiri, û ê din ra jî kêrikê û bukkê dikiri tê mal. Diwê min tişte we anî. Waya diwê ke, ka ez xu di dolabê da veşêrim,hele keçik çi diki? Keçik bukê didi ber xu û buk wê ra tê zar;

Diwê bukê heft sala dora vî mezeli kê pakir?. diwê te kir. Diwê bukê heft sala dora vî mezeli kê av da? Diwê te av da. Keçik kêrê derdixî ku xu ra ki,merik ji dolabê bazdî û radihêle zendê,radihêle zendê; diwê xêri te heta niha ji min ra ew negot?

Keçik diwê ê reş rê neda min ku ez biwêm. Wê li ber min got.

Merik ê reş diqewtîni û bi keçika mormircan va heta doyê heyatê xu bi hevra dimînin.

Çîroka min rast, min xar tasik mast

Guhdaran tiliya xu dalast.

Çavkani: **Fama jin Qajo.**

Mikaîla(Inler-Polatlı)

Berhevkar: **Dr. Mikailî**

Jêrenot: Ev çirokana ji dêvê Cito hatine zar, min wekina nivisandin. Ji boy ku meri bizane li Gundi Mikaîla meriya bi kijan devokê Kurdî deng dikan. A dudiya jî; gotinên tirkî jî min orjinal dîn û kirinê. Ew jinikê ku ser 70 saliyê ye û tirkî belkî qe nizani, wana gotin. Dû ra min pirsî ku, Berê çirokzanên kurd ji boy ku bira biwêjin ew pir bi zane ye û zimanên din jî dizane, yek cara tirkî ji dikirini nav çirokên an jî klam û stranên xu.

Ez li vir ji Lawike Xaltiya Fam Qadir ra jî spasdarî ya xu diwêjim.

Ferhengok:

Ro=roj

Meri=insan

Zend=bilek

W=b

Xwe=xu

Mezel=gor

STRANÊN FOLKLORÎK

ZÊWIK

Ji ku tê yî Dîyarbekir
 Çiqina lêwîk mûj û şekir
 Bi heft quran û heft hemîlî ya we
 Min ji vî gundî bîra te kir

Vê çûçîkê vîyê vîyê
 Ez derketim min go çî yê
 Got xwazgînî yê Zêwîkê hatinê
 Dezî yê dilê min qetî yê

Dile mino tine tine
 Çî bûyê biroya arê xwe li bine
 Destê xwe di destê min ke
 Ser min-te ra xwedê yî mezine

Herem: Xelîka (Qerecdax)

BODIKÊ

Hey Bodîkê Bodîkê
 Hawar yalla Bodîkê
 Manga belek ho dikê
 Hawar yalla Bodîkê

Bodîk çûyê bin dara
 Hawar yalla Bodîkê
 Piş ta xwe da Zinara
 Hawar yalla Bodîkê

Mange dut golik berda
 Hawar yalla Bodîkê
 Av dida silav neda
 Hawar yalla Bodîkê

Bodîkê tûne kîze
 Hawar yalla Bodîkê
 Qaeş î xorta dilîze
 Hawar yalla Bodîkê

Çavkanî: Anonîm

MÎVANO

Ez nadimê nadimê
Yar nadimê nadimê
Bûm qurban bejna zirav
Qaş û brû qelemê

De tu raw-rawe mîvano
Neqeret (Revan)
Ez hatim ketim ciyano
Tu paçke herdu memikano
Sewa xatirê dê û bavano
Tu paçke herdu çavano
Sewa xatirê dê û bavano

Çi tebrûse li navê
Te re bişînim silavê
Bûm qurban bejna zirav
Helka heyne were avê

Jêrî ya mala genime
Genim rawû bû rime
Mala xasîyê nekeve
şar girêda li dor kume

Çavkanî: Kûrt Remzî

Çiya BILIND IN

Ez bûm berfa serê çiya
Ro bilind bû gî helîya
Keçê deste min bigirin
Dezî yê dilê min qetîya

Çiya bilindîn bê dar nabin
Newal kûrin bê av nabin
Keçê destê min bermede
Qe tu dizanî bê te nabim

Ez derketim serê gira
Bang dikim bav û bira
Rindê xebera te tuneyî
Bi tenê me li ber dîwara

Çavkanî: Kûrt Remzî

HERE LÊ LÊ

Jêrda tê xwe meleqîne
Pişkojê sîngê xwe vêxîne
Rindê dost bivîne tiş tek nîne
Dijminê navî te biderxîne

Here lê lê bi saltî yê
Neqeret (Revan)
Ji min re bû seva Mîdyatî yê
Bazar bazar tere satî yê
Min ji xwe re kire goza terazîyê
Çima tu qe nehatî tartîyê

Ezê baxçe bavî te bi darkim
Giran giran ser re gavkim
Destê xwe bi destê minde
Ez û tu ji gundê gawir barkim

Mesekine li pî bêrî yê
Ser suretê sor daket sîyê
Ka soza min û te rindikê
şeva çûyî ber camîyê

Porê xwe vemeke meke têle
Ez te terk nakim vaya dile
Sûcê min xênedî yî çiyê
Qey va qanûna dile

Çavkanî: Gelerî

Herêm: Anonîm

CIVATA KURDÎ LI AUSTRALYA

(Gotara vekirina Konferensa Kurdî li Sydney: 15/10/2001 / Ji inglîzî hatiye wergerandin)

Gellek beşdarên di vê konferensê de dê ji rewşa gelê kurd baş agahdar bin. Ez ê tenê bi kurtî behsa trajêdiyên diltezîne yên hatine serê neteweya kurdî bikim. Dîrok di derbarê vê neteweyê de ne adilmend bû; hêzmezînen cîhanê, yên duhinî û yên îroj, di siyaseta xwe ya di derheqê Kurdan û welatê wan de ezo û berjewendîperest bûn. Welatên ku Kurdistanê parvedikin, li milê din, her stemkarî domandine'û li dij wê yekê bûne ku siyaseta xwe bidin guhertin. Di sedsala borîn de hukûmetên Tirkîyeyê, Îraqê û Îranê gellek caran li herêmên kurdî bûyerên kuştina giştî bi rê xistine û her şêwe çekên ji rojava û rojhilat li dij Kurdan bi kar hanîne, her weha çekên kîmawî ku tenê li Helebçe, di sala 1988an de, bûn egera mirina dora 5000 medenîyan. Li gellek aliyên Kurdistanê bi milyonan mirov bi darê zorê ji cîh û warên xwe hatin bidûrxistin û bi hejmarên mezin hatin asîmîlekirin. Tenê di nav 20 salên borîn de dora 8000 gund, hema li beşên di bin desthelatdariya Îraqê û Tirkîyeyê de, hatin wêrankirin. Îroj dora 35 milyon mirovên ku xwe wek kurd dizanin ne tenê ji mafê birêvebirina welatê xwe, ku ji 500 000 kilometirên çaralî pêk tê, hatine bêparkirin, lê her weha ji

mafên xwe yên bingehîn, wekî bikarhanîna zimanê kurdî ji bo perwerdekirinê û ragihandina di radyo û televizyonê de.

Ber dora du hefteyan parlemana tirkî rêbaz guhert û hat ragihandin ku rê li pêş bikarhanîna zimanê kurdî di radyo û televizyonê de dê vebe. Lê li dû çend rojan serdarê hêzên leşgerî, General Kivrikoğlu, gote rojnamevanan ku va yeka nikare cîh bigire çimkî qanûnên din hene ku tenê rê didin bikarhanîna zimanê tirkî ji bo van amancan.

Beşekî biçûk ji Kurdistanê, li herêma ku wek "bakurê Îraqê" tê binavkirin, di dema ku ji aliyê desthelatdariya kurdî de tê birêvebirin, ew ji aliyê rêxistina Nete-weyên Yekgirtî de nahête nasîn. Ne dewleteke rojavayî, ne yeke îslamî û ne jî yeke din amade ye ji vê rêxistinê parastina herêmê daxwaz bike, heke rojekê hêzên firrokî yên emerikî û inglîzî dest ji parastina wê berdin.

Divêt bête gotin ku Kurdistan welatekî bi neftê, avê û çandiniyê dewlemend e. Ew xwedîya çelengiyêke xweristî ye û tê de pêkaniyên ku wê bikin welatekî rewş-xweş hene. Lê dewletên serdest bi mebest deverên kurdî ji pêşkeftinê bêpar dihêlin da ku hejmareke bilind ji Kurdan neçare koçkîrinê bikin.

Australya yek ji wan welatan e ku Kurdên di nav 35 salên borîn de welatên xwe li cîh hîştin lê cîhwar bûn. Dema ez di sala 1968an de gihîştim Australya min hay ji hebûna civateke kurdî li vir nebû, lê komeke biçûk ji Kurdan hebû, li gel ku wê demê beşekî ji civata tirkî bû jî. Dikare bête gotin ku pîrraniya Kurdên destpêkê ji wan kesan bûn ku di nivê 2yem yê salên 60an de li gel koçerên tirk gihîştibûn vir, bi encama vebûna deriyê Australya ji bo koçerên ji Tirkiyeyê. Pîrraniya wan rasterast ji deverên kurdî nehatin. Wan li bajarên tirkî kar dikirin û ji wir daxwaza koçkirina bo Australya kiribûn.

Me di sala 1979an de yekem komeleya kurdî li Australya li bajarê Sydney damezirand. Ew ne karekî hêsan bû. Her tiştê bi navê kurdî, heta li Australya be jî, ji aliyê gellek endamên civatên tirkî û erebî de wek ramanekê veqetxwaziyê û cudabûnê dihat lênerîn. Pîrraniya Kurdên ji Tirkiyeyê endamên rêxistinên tirke sosyalîst bûn ku damezirandina rêxistineke kurdî di cîh de nedidîtin. Di destpêka 80yan de endamên dora 30 malbatan di komeleyê de endam bûn. Ew rêxistina kurdî di wê demê de di amanc û dîtinên xwe de yekta bû. Bawer dikim ew wê demê ya tenê bû ku her mirovê kurd, ji ku bûya, yan piştgirê çî rêxistina siyasî bûye, dikaribû tê de bibûya endam. Her weha yekta bû çimkî xwe wek rêxistineke australî ya ji bo Kurdên Australya dihesiband, ku di eynî demê de piştgiriya maf û têkoşîna hemî beşên Kurdistanê dikir, ne ku piştgiriya vê yan wê partiyê. Ew rêxistinek bû ku hewcedariyên Kurdên Australya dida ber çav û di eynî demê de ew bizava dikir ku haydariya gitî bikşîne ser pîrra kurdî û piştgiriya ji bo mafên gelê kurd bi dest xe. Li gel ku civata kurdî wê demê biçûk bû jî rêxistinê roleke mezin

leyizt û dikaribû navekî ji bo civata kurdî li vî welatî bi cîh bike, folklor û çanda gelê kurd bi hemwelatîyên australî bide nasîn, piştgiriya bo pîrra kurdî û alîkariyê bo penaberên kurd bi dest xe. Rêxistinê her weha pîrrên dostaniyê di navbera endamên civata kurdî û yên tirkî, erebî û farisî de bi rê xistin.

Pîrraniya Kurdên li Australya di destpêka 80yan de li Sydney û Melborn cîhwar bûn. Jimara wan, bi encama zewacê, hevgihandina malbatî û hatina hevalan sal li dû salê zêde bû. Ta nivê 80yan tenê çend Kurdên ji başûrê Kurdistanê li vir hebûn û bi pîrranî xwendekar bûn. Di nivê 2yem yê 80yan de, bi taybetî li dû bikarhanîna çekên kîmawî li Helebçe hejmara Kurdên ji başûr û rojhilatê Kurdistanê dest pê kir zêde bibê. Di adara 1991ê de, li dû şerê kendavê, dora milyonek Kurdên başûrê Kurdistanê derketin ser çiyayê, yan berî dan sînoran. Bi encamê pîrra kurdî bi şeweyeke bêyî hempa li cîhanê hat nasîn. Hejmareke ji welatan, Australya jî di nav de, vîzayên taybetî dan penaberên kurd. Pîrraniya wan ji başûr û rojhilat bûn. Divêt li vir bête gotin ku hejmareke ji Kurdên wê demê li Australya bûn layiqe pesindariyeke mezin in. Bêyî xebat, piştgirî û alîkariya wan bêtir ji nivê Kurdên îroj li Australya dê nuha ne li vir bûna. Divêt her weha rola wezîrê wê demê yê kar û barên koçberiyê, birêz Gerry Hand, bête bi bîrhanîn.

Çima Kurd hatin Australya?

Gellekan Australya ji bo asayîşê, demokrasîyê, û ayindeyeke (pêşerojê) baştir ji bo zarokan bijartin, bi hêviya ku ew li vir wekhevîyê bi dest xînin. Hinan xwe bi rêya Rêxistina Navneteweyî ya Penaberan (UNHCR) gihandin vir, hinên din bi alîkariya malbatên xwe, yan dostên xwe. Lê

çawa be jî, me hemiyan faktorekî hevbeş heye ku xwe bi beşbeşbûna welatê me û bêparmayîna gelê kurd ji mafên xwe yên neteweyî û çandî ve peywendîgir dike.

Li gor encamên agahiyên giştî yê 1996an, nêzikî 1500 axifgerên zimanê kurdî wê demê li Australya hebûn. Va hejmara ne yeke di cîh de ye çimkî carine, hema li Sydney, dora 700 Kurd di konsêrek de beû dar bûne. Em hêvî bikin ku encamên agahiyên îsal hatinê berhevkerin ji hejmara rasteqîne nêziktir bin.

Dema yekemrefên ji Kurdan gihîştin vir pîr kêm bûn li Australya kesên ku di derbarê Kurdan de tiştek dizanibûn. Nuha navê kurdî êdî xwe li vî welatî bi cîh kiriye. Di forma berhevkerina agahiyên pênc salane de, wek nimûne, "kurdî" heta wek mînak hatibû dayîn, di derbarê raberkerina paşrehên etnîkî de. Me di dezgeha SBS de bernameyeke radyoye heftane heye ku digihê guhdarên li Sydney û Melborn; me bernameyên radyo di dezgehên herêmî de hene; me 3 weşanên nivîskiye demî li Sydney û Adilayd hene û me gellek rêxistin hene.

Kesine dibêjin ku civata kurdî yeke bi kêşe ye. Ev gotineke ji rastiye dûr e. Bêguman e ku her koma li welatekî nû bi cîh bibe dê hewcedara alîkariya di hinek waran de be, lê dema mirov hemî asteng û aliyên xwe bi rewşa Kurdan û welatê wan ve peywendîgir dikin bide ber çav ew ê diyar bibe ku rewşa civata kurdî li Australya tê de û encamên hatinê bidestxistin cîhên serbilindiyê ne. Helbete navê ku mirov civata kurdî bide hemer civateke wek ya îtalî, çimkî Kurdên li Australya kêm-zêde ji 30 salan û vir de li vir cîhwar bûne, ne ku ber bêtir ji 100 salan hatine; Kurd ji gellek welatan hatine, ne ku ji welatekî serbixwe; li welatê wan yê beşbeşbûyî, şûna ku merî û dostên wan lê ne,

şer, stemkarî, bêaramî û astengên cihêreng berdewam in. Heke mirov tevahiya van faktoran têxe hesêb û ji nêzik ve li dîroka cîhwarbûna Kurdan li Australya binihêre, ew ê baş bête xuyakirin ku pîraniya endamên vê civatê ji kiryarên bikarhanîna zorê dûr mane, ku li gel hemî asteng û dijwariyên ji rewşa welatê wan tê de hatinê der jî proseya bicîhbûna wan li vir yeke serkeftî bûye. Îroj Kurdên Australya di şûn û dezgehên cuda de di kar de ne û rewşa aborî ya gellekan ji wan baştir dibêye. Nayê inêkirin ku carekê, yan du caran, kiryarên ne di cîh de cîh girtine û dezgehên mîdyayê, mixabin kesine jî, van kiryarên ku tê de çend kes beşdar bûne xistine stuyê tevahiya civata kurdî ye. Lê rastî ew e, li bervaciya iddîaya hinan, ku civata kurdî di derbarê proseya bicîhbûna li vî welatî de xwediya rêyeke serbilind e.

Hinekên din wisa bawer in ku yeketî di nav civata kurdî de niye. Li gel ku pêkan e gotineke wisa di derbarê rêxistinene de di cîh de be jî, rastiya li holê ew e ku di nav endamên civata kurdî de çî caran şer cîh negirtiye. Helbete şûn ji bo baştirkerina rewşê heye. Bi dîtina min civata kurdî ya îroj hewcedarî bi rêxistineke bi hêz heye, rêxistineke serbixweye ku napejirîne bibête berdevka çî rêxistinên siyasî. Partiyên kurdî bi xwe jî êdî dizanin ku Kurdên li derve heke di jiyana xwe de ne serkeftî bin, ew ê nikaribin alîkariya doza kurdî jî bikin. Ew ê li berjewendiya gelê kurd be, û ji bo dîredemê li berjewendiya partiyên kurdî bi xwe be jî, ku rêxistinên siyasî tiliyên xwe nexin nav kar û barên civatên kurdî li derve. Li welatên demokratî yê wek Australya partiyên kurdî maf hene li ser navên xwe ofîsan vekin. Peywendiyên baş dikarin di navbera wan û rêxistinên civatî de hebin, lê ne di cîh de ye ku ew xwe wek berpirsiyarên endamên civatê bi nav bikin, wekî ku ew rast

Xwendewanên hêja yên Bîrnebûnê

Cara siftê min kurdên Anatoliyê li Kurdistanê nas kiribûn. Lê hiç nedihat bîra min ku rojekê ez ê li welatekî sar, ku li bakurê wî dawîya dinê tê, yanê li Swêdê wekî mamostê kurdî dersê bidim zarokên wan.

Belê di sala 1986 an de min li belediya Nacka kar dikir. Rojekê pîreka rehmetî Cewdet Demir ji min re got ku kurikên wan dixwazin bi kurdî dersê bigrin, lê li taxa wan mamostên kurdî tune ne ku dersê bidin wan. Min bi çar saetan li Fittjayê dest bi kar kir. Sê şagirdên min hebûn. Lê li dibistanên ku min kar dikir zarokên kurdî pir bûn û hemûyan bi tirkî dixwend. Di nav mamostên tirkî de gelek kurdî hebûn û wan dersa tirkî dida zarokên kurdan. Wan, zarokên kurdan ne tenê zarokên kurdî fêrî tirkî dikirin, lê wekî li Tirkîyê hin erf û adet, rojên ahî û netewî ên tirkî jî fêrî wan dikirin. Lê zarokên kurdên Anatoliyê hem li malê, hem jî li derve bi hev re bi kurdî dipeyivîn, û piraniya wan bi tirkî jî nizanibûn. Ev neheqiyek mezin bû li zarokan. Li gor destûra zimanê zikmakî a Swêdê diviyabû van zarokan bi kurdî bixwendaya. Min bi çend malbatên kurdî ên li Fittjayê mudirên dibistanan agahdarî dan hem malbatên kurdî hem jî mamostên tirkî. Sal bi sal hejmara zarokên kurdî ên kurdî dixwînin zêdetir bûn. Û îro şûna roj û cejnên netewî ên tirkî, Newrozê pîroz dikin.

Îro li belediya Botkyrkayê qasî 270-300 zarokên kurdî Anatoliyê bi zimanê kurdî dersê digrin. Bêşik ev ji bo me kurdan ser-

ketineke mezin e. Îro 7 mamostayên kurdî li gor îmkân û zanîna xwe bi kêfxweşî û bi hewes şagirdên xwe hînî kurdî dikin.

Kêmasî û çewtîyên me pir in, lê ku wek îro dewam bike û danûstandinên me bi malbatan re xurttir bibin, em ê rewşa şagirdên xwe baştir bikin ku ew di dersên xwe de serketî bin.

Ez bi xwe li du dibistanan kar dikim. Li van her du dibistanan qasî 65 û şagirdên min hene. 62 jî wan kurdî Anatoliyê ne û piraniya wan jî gundê Omeran in. Piraniya wan, merivên hev in û hemû wek malbat hev nas dikin.

Em tenê dersa kurdî nadin şagirdan. Lê em di dersên din de jî alîkariya wan dikin.

Li belediya Botkyrkayê mafê hemû û şagirdên biyanî heye ku heftiyê saetekê bi zimanê xwe dersa bigre. Hêvî dikim zarokên kurdî ên ku bi kurdî naxwînin, vî mafê xwe bi kar bînin.

Malbatên hêja!

We li dijî dewleta tirkî a zordar a ku 80 sal e dixwaze zimanê me wînda ke, bi mêranî çanda me û zimanê me parast. We zimanê kurdî li dijî asimilasyonê wek çekeke xurt bi kar anî. Îro li Swêdê zêdetir îmkânên me hene ku em bi zimanê xwe bipeyivin, binivîsin. Daku zarokên me di dibistanê de zêdetir bi ser kevin. Em mamostên zimanê kurdî jî dil û can dixwazin ku zarokên kurdan bixwînin û di jiyana xwe de bi ser kevin. De werin em ji bo pêşeroja zarokên xwe bi hev re kar bikin ■

Mûcîzeyaya Kurdên Anatoliya Navîn

R e m z î K e r î m

Dema min di pirtûkeke dersê de gotina “mûcîze” ji bo kurdên Anatoliyê û parastina zimanê kurdî bi kar anî, hin mamostayên zimanê kurdî rexne li min girtin ku ez mubalaxe dikim. Lê her cara ku guhdariya kurdiya kurdekî Anatoliyê dikim, ji gotina “mûcîze” zêdetir gotinek ku ji pirsra “van kurdên hejmarkêm 330–400 salan, bi gund û bazar û qedexa û bi zimanekî biyanî dorpêçkirî, çawa heya îro zimanê xwe winda nekir?” bibe bersiv nayê hişê min. Bêguman wê bersivên “ilmîtir” jî hebin, lê gotina “mûcîzeyaya kurdên Anatoliyê” ne mubalaxe be.

Eger mirov bipirse gelo eger van kurdan zimanê xwe ji binî bîr bikiraya, qet bi kurdî nepeyiviyana, wê kî ji wan ji xwe re bigota kurd, yekî ji yekî biyanî re wê çawa ferqa yekî kurd û yekî tirk xuya bibûya? Em li ser “eynî” erd dijîn, dîne me yek e, urf û adetên me çi bigre wek hev in, fizyonomiya me wek hev e, em bi sedan salan bi hev re jiyane, bi malbatî em tevî hev bûne. Em di eynî dibistanan de bi heman kultur û heman ziman perwerde bûne.

Lê ji bo bersivê bes e ku mirov li “Anayasa” ya Cumhuriyeta Tirkîyê binêre. Di “Anayasa” ya 1982 ê de 10 bendên esasî bikaranîna zimanê kurdî di hemû warên jiyana rojane û jiyana ruhî de qedexa dike. Hemû kefteleştên Tirkîyê yên “qanûnî” û neqanûnî, gî tevgera wê ya mezin ji bo asîmilasyona kurdan li dor armanceke esasî

ye: Kurd zimanê xwe ji bîr bikin; bi riya tirkîfize kirinê kurd parçekî esasî a nasnama xwe ya millî winda bikin; ruhê kurdbûnê li ba kurdan sist bibe. Bêguman mirina kurdî JI BO KURDAN ne tenê dikare dawuya nasnama wan a millî be, lê dibe fermana kuştina kultura kurdî jî. Êdî şik tune ku ziman ne tenê alava danûstandinê, û îfadekirina hîs û ramanan e, lê ziman her weha serkaniya kulturî a milletê xwe ye jî. Ziman û îfadeyên bi wî, gotin – gotinên pêşiya, metelok, çîrok, çîvanok, serpêhatî, pêkenîn, stran, gotinên seremonî û cejnan, berhemên edebî, berhemên hunerî, daxwaz û duayên dînî ûhw.– kultura xwe îfade dike.

Şagirdên Kurd

Kurdên Anatoliyê wek grup berî kurdên bakur koçî Ewropayê kirine. Hejmareke baş a wan li Swêdê û gelek malbat jî li belediya Botkyrkya–Stockholm bi cî bûne. Di destpêkê de wekî piraniya kurdan wan jî ji zarokên xwe re di dibistanê de zimanê tirkî wek zimanê zikmakî hilibjartiyê. Sedemên biheq ên vê yekê hene, lê ne behsa vê nivîsê ne. Bere bere hejmara şagirdên kurdên Anatoliyê yên ku kurdî dixwînin pirtir bûye. Di van 3 salên dawiyê de li belediya Botkyrkayê hejmara şagirdên kurd ên ku daxwaza xwendina kurdî kirine:

Ji 6 salî heta sinifa 3 a lîseyê:

Sala 2000	221 şagird
Sala 2001	247 şagird
Sala 2002	293 şagird

Ji van %96 şagirdên kurdên Anatoliyê ne. Eger mirov bide ber 10–12 salên berê hejmara şagirdên kurdîxwên sal bi sal zêdetir bûye. Ev bi serê xwe kêfxweşiyek e. Tevî vê jî li gor texmînan %30–40 şagirdên ku li Botkyrkayê zimanê tirkî dixwînin, kurd in.

Zimanê kurdî yê şagirdan

Li ser zimanê kurdî bi giştî lêkolîn kêm in, li ser kurdiya kurdên Anatoliyê lêkolînên tekûz hîç tunene. Min bixwe tenê di Bîrnebûnê de çend maqale xwendine. Ji bilî qedexeya li ser kurdî û encamên wê li ser kurdiya kurdan, ez dixwazim li gor tecrûbeya xwe hin noqteyên ku bala min kişandine bibêjim:

Wek kurdên Kurdistana bakur ên Anatoliyê jî berî ku li Tirkîyê dest bi dibistanê bikin, bi piranî zimanê wan ê serdest kurdî ye. Lê zarok hîn di zikê diya xwe de bi riya televizyon, rojname, û zimanê bazarê tirkî dibihîse. Û herî dereng 6 yan 7 saliya xwe de dest bi dibistanê dike. Tirkî bere bere serî ji kurdî distîne; dibe zimanê xwendinê, zimanê nivîsandinê, zimanê înfomasyon û zanînê, zimanê hîs û ramanan, zimanê peyvînê û kurdî di çiyê xwe de dimîne, gotinên ku aktîf bi kar nayên, tên ji bîr kirin. Zarok bi tenê bi dê û bav û xuşk û bira û meriyên xwe re li ser tiştên basît ên rojane bi kurdî dipeyive. Eger mirov bifikire ku bav yan dayikek kurd rojê çend cumleyan bi zarokên xwe re û li ser çî bi kurdî dipeyivin, mirov dikare texmîn bike ku li ser hev nabin 5 deqîqe. Ev

peyvîn jî ne di atmosferek sohbetî lê bi emir dayînê ye.

Îca ev zarok di 7–10, yan 12–14 saliya xwe de bi malbata xwe re koç dike, tê Swêdê berî ku wek hevsalên xwe ên tirkî fêrî tirkî bibe.

Li Swêdê dest bi sinifa amade kirinê dike ji bona ku berî sinifa “normal” hinek fêrî swêdî bibe û paşê li gor emrê xwe here sinifa normal. Piştî salek yan du berî ku fêrî swêdîyek bibe ku pê bikaribe dersên dibistanê bixwîne û bi ser keve, diçe sinifa şagirdên swêdî yan biyanîyên ku li Swêdê hatine dinê. Tevî ku bere bere swêdî şûna tirkî digre lê hevsalên wî jê baştir bi swêdî dizanin û swêdiya wî têra famkirin û çêkirina dersên “swêdî, matematîk, kimya, fîzîk, biyolojî, tarîx ûhw” nake. Gava şagirdê kurd tê sinifa 9 zimanê wî/ê ê swêdî li gor hevsalan pir qels e û ev qelsbûneke giştî a gî dersan peyda dike; ji ber ku şagird dersan rind fam bike, divê swêdî rind bizane. Ev yek barekî mezin dixê ser milên şagirdan û gelek cara şagird di bin vî barî de dilikumin, dikevin.

Di van 3 salên dawiyê de notên dersa swêdî ên şagirdên kurd ên ku zimanê kurdî jî dixwînin weha ye:

dibistan: Fittjaskolan (sinif: 9)

sal	hejmara şagirdên kurd	hejmara şagirdên ku nota zayîf girtine
2000	14	7
2001	11	4
2002	10	4

Di nav wan de şagirdên li Swêdê hatine dinê, hene. Lê şagird ji bona ku here lîse, divê bi kêmanî sê dersan; swêdî, matematîk, îngilîzî bi ser keve. Rewşa

şagirdan di İngilîzî de xirabtir e. Bêguman sedemên vê yekê pir in, lê mixabin wek gelek warên din, di vî warî de jî lêkolîn tune ne û xuya ye wê ji bo wextekî dirêj jî tune bin.

Bi kurtî şagirdên kurd ên ku di 5–6, 8–10–12 saliya xwe de ji bakur tî Swêdê gava sinifa 9 tewaw dikin, zimanekî wan ê serdest tune ye. Ne kurdî, ne tirkî û ne jî swêdiya wan li gor hevsaletên wan e.

Du mantiq du problem

Mîvantî

Ji xeynî rewşa siyasî ya kurdan û sedem û encamên wê, çend gunehên civata me kurdan bi xwe jî hene ku barê zarokên me girantir dikin. Ev serê 20–30 salan e ku em hatine Ewropayê; zarokên me li vir çêbûne, mezin bûne, zewicîne; zarokên wan çêbûne, hîn jî em xwe wek mîvan dibînin. Hîn jî yatirimên me yê herî mezin ne li vê derê ne. Hîn jî em dibêjin “belkî rojekê em vegerin”. Komele û federasyonên me jî di eynî rewşê de ne: Hîn jî federasyona me na ya KURDÊN SWÊDÊ ye, lê a kurdên li Swêdê ye. Mantiqê mîvantî rê digre ku em yatirimê li zarokên xwe kin, ji bo xweşkirina mustaqbelê plan-

eke me hebe û em wext û perê xwe ji bo mustaqbelê wan xerc bikin.

“Eti senin kemiği benim”

Ev li Tirkiyê gotineke meşhûr e û bi piranî helwesta xelkê li hember dibistanan û wezîfeya dibistanan de xwe dide pêş. Li gor vê mantiqê bi giştî wezîfa dê û bavan û wezîfa dibistanan belî ye; wezîfa dê û bavan ew e ku zarokên xwe bişînin dibistanê. Wezîfa dibistanan ew e ku zarokan bikin meriyên jêhat, baş, biaqil û doktor û avukat û muhendis. Baweriya dê û bavan bi dibistanê pir mezin e û zarokên xwe teslîmî dibistan û mamostan dikin û dipên ku zarokên wan bi ser kevin. Ev bawerî çiqas pir e, ewqas jî rola dê û bavan di jiyana dibistana zarokan de ewqas kêr e. Lê li Swêdê dê û bav, malbat stûneke esasî ne ji jiyana xwendinê. Sîstem wa ye ku alîkariya dê û bav û malbatê ji bo serketina şagird pêwîst e. Mixabin şagirdên me pirî caran ji vê alîkariyê bêpar in. Gelek cara meriv tê derdixe ku dê û bav gava zarok tê sinifa 9 biryara mustaqbelê wî/ê didin; “pizzeria– zewac– li ba bav îş kirin” yan jî zarok li malê bêxwendin dimîne.

Wecîz (Biwêj)

- ✓ *Güneşin sana ulaşmasını istiyorsan, gölgeden çık.*
Tu dixwazî tîna rojê bigêhêje te, ji siyê bi derkeve.
KONFUÇYÜS
- ✓ *Azınlık haklarını korumak için, geçici olarak çoğunluğu azınlık yapmak gerekir.*
Ji bo ku mafên hindikahîyan biparêzî, divê pîranîyan demekê bikî hindikahî.
MARTIN LUTHER KING
- ✓ *Barış bile büyük ücretlerle satın alınır.*
Aşitî bile bi bihayên giran tê standin.
BENJAMIN FRANKLIN
- ✓ *Barışta oğullar babalarını, savaşta babalar oğullarını gömer.*
Di aşitîyê law bavên xwe, di şer jî bav lawên xwe binerd dikin.
KREZÜS MAVON
- ✓ *Savaş hırsızlar yaratır, barış ta onları asar.*
şer dizan diafrînin, aşitî jî wana darda dike.
GEORGE HERBERT
- ✓ *En kötü barış, en haklı savaştan iyidir.*
Aşitîya herî neçê, ji şerê herî biheq (mafedar) baştir e.
CÍCERO
- ✓ *Barışı korumanın yolu, savaşa hazır olmaktır.*
Rêya parastina aşitîyê, ji şer re amede bûyîne.
WASHINGTON
- ✓ *Yalanlarla kandırılmadıkları sürece, halklar kesinlikle savaş düşkünü değildir.*
Gel tu dema ku bi derewan ne hatin xapandin, ew tucar babin heyranê şer.
EINSTEIN
- ✓ *Bana yaşamı iki kavram sevdirdir: Özgürlük ve aşk.*
Aşk için yaşamımı veririm, ancak özgürlük için Aşkımdan da vazgeçerim.
Du feraset jîyanê bi min didin hezkirin: Azadî û evîn.
Ji bo evînê ezê jîyana xwe bidim. Lê ji bo azadîyê ezê dest ji evîna xwe jî berdim.
VICTOR HUGO

- ✓ *Basın özgürlüğü öyle bir özgürlüktür ki, onsuz diğer özgürlüklerin hiçbiri yaşayamaz.*
Azadîya çapameniyê, azadîyeke wisa ye ku bê wê, tu azadîyên din naîjn.

EINSTEIN

- ✓ *Başarının babası pek çoktur, yenilgiler yetimdir.*
Bavên serkeftinê pir in, binketin sêwîtu ye.

J. F. KENNEDY

- ✓ *Adaletsiz düzeni adaletle yıkınız. Alkışların önüne kansız elle çıkın.*
Sazûmana bê edelet bi edeletê helweşînin.
Bi destên bê xwîn derkevin pêşîya çepikan.

GANDÎ

- ✓ *Arkadaşlık ağaca benzer; kurudu mu bir daha yeşermez.*
Hevaltî wek darê ye, dema hişk bû carek din hêşin nabe.

N. HİKMET

- ✓ *İnanmadıklarını yazan yazardan aşağı insan yoktur.*
Vardır... inandıklarını yazmayan.
Tu însan ji niviskarên bê bawerî dinivisîne berjêrtir tuneye.
Heyê... yê n ku bawerîyên xwe nanivisînin.

ÖZDEMİR ASAF

- ✓ *Bütün renkler aynı hızla kirleniyordu, birinciliği beyaza verdiler.*
Her renek bi lezeke wek hev qilêr dibû, yekemenî dane rengê spî.

ÖZDEMİR ASAF

- ✓ *Başarı, her zaman erdemın varlığına kanıt olmaz.*
Serkeftin her demekê ji hebûna xûpakî yê re ne delîl e.

KONFÎÇYÜS

- ✓ *Bin kilometrelik bir yolculuk da küçük bir adımla başlar.*
Rêvîtiya ji hezar kilometreyê jî bi gaveke biçûk destpêdike.

METELOKA ÇÎNA

- ✓ *Bilmeyen ve bilmediğini bilen çocuktur, ona öğretin.*
Bilen ve bildiğini bilmeyen uykudadır, onu uyandırın.
Bilmeyen ve bilmediğini bilmeyen aptaldır, ondan sakının.
Bilen ve bildiğini bilen öncüdür, onu izleyin.
Yekî ku nezan û nezanîna xwe dizane zarok e, bi vî bîelimînin.
Yekî zana û zanîna xwe nizane di xewê de yê, wî şîyar bikin.
Yekî nezan û nezanîna xwe nizane behiş e, xwe ji wî biparêzin.
Yekî zana û zanîna xwe dizane rêber e, wî bişopînin.

METELOKA ÇÎNA

Ferhenga Kurdî-Holendî

Ferhenga yekemîn a Kurdî-Holendî (kurmancî-holendî) hat weşandin. Ew ferheng karekî hevbeş a Nêçîrvan Qilorî û Mahabad B. Qilorî ye. Birayên Qilorî ji Anatoliya Navîn, ji bajarê Aksarayê ne. Wek tê zanîn ev herdû bira jî nivîskarên kovara Bîrnebûnê ne. Ev ferhenga di meha 12 an a 2002 an de ji aliyê weşanxaneya Bulaaq ve hat weşandin.

Ew demeke dirêj e kurdên li Holendeyê benda vê ferhengê bûn. Piştî xebateka 6 salan ew ferheng hat tewaw kirin. Ferheng jî 365 rûpelan pêk tê. Pêşgotina ferhengê ji hêla Prof. Martin van Bruinessen ve hatiye nivîsîn. Pêşgotin li ser dîroka wêje û ferhengên Kurdî ye. Ew 40 sal in ku Kurd li Holendê dijîn. Lê mixabin heta niha ferhengek Kurdî-Holendî nehatibû weşandin. Bi derketina vê ferhengê va valahiyek mezin hat tîjî kirin.


Li jêr em pêşgotina Prof. Martin van Bruinessen ku ji bo vê ferhengê nivîsiye, ji xwendevanên Bîrnebûnê re pêşkeş dikin.

Red. Bîrnebûnê

Kurdî, zimanekî bi derd e. Ev ferhenga, rêberê e, ji bo zimanekî ye ku, axaftvanên wî, di welatê xwe de, bi fermî tune ne. Axaftvanên vî zimanî weke hindikahiyek çandî nayên pejirandin û têkoşina dayîna perwerdeyî di vî zimanî de weke awayekî terorê tê dîtin. Bi xwe navdayîna vî zimanî ewqas hessas e ku, di qanûna ku weşanên Kurdi qedexa kiri bû de, izahek girîft bikar anî bû, ku tê de xeynî Tirkî behsê tu zimanekî din nehat kirin. Li gorî Qanûna Weşanên di Zimanên Xeyrî Tirkî ya sala 1983 de tenê weşandina pirtûk û rojnameyên bi hemû zimanên fermî yê yekemîn yê dewletên ku ji hêla Tirkiyê ve hatine naskirin, serbest bû û hemû zimanên din qedexa bûn. Kurdî li Irakê zimanê fermiyê duwemîn û li Ermenistanê jî nîv-fermî bû; ew tarîfa qedexekirinê bi awayekî zelal nîşan dide, ku berê xwe dayî ye kîjan zimanî. Di sala 1991'ê de ew qanûn di bin tesîra Serokwezîr Ozalê,

ku dixast Tirkiye bi lez tev li Yekitiya Ewropayê be û wî dizanî bû ku çareserkirina pirsgrêka Kurdî û ya Qibrîsê şartên pêwîstî bûn, de hat betal kirin. Heta nîva sala 2002'a tu kesi bi gavên nu ve, di rêya naskirina mafên çandiyên Kurdan de, neda li ser şopa Ozal. Her çiqas diviya bû ku Tirkiyê, jibo tevlibûna Yekitiya Ewropê, mafên perwerdeyî, radyo û televizyonên bi Kurdî bipejirîya, li diji vê yekê piraniya leşkeran û giregirên dewletê berxwedanek tund dan. Ancax di tebaxa 2002'ê de perlemana Tirkiyê qanûnek pejirand, -bê gotina navê Kurdî- ku bernameyên radyo û perwerdeya şexsiya "bi zimanên ku li Tirkiyê tînin axaftin" serbest e.

Jiber ku Kurdî bi fermî nedihat pejirandin, statîstîkên baş li ser hejmeta axaftvanên Kurdî tune ne. Heta sala 1965'an di hîlbijartinên giştî de zimanê zikmakî çî ye û mirov kîjan zimanên din dizane, dihat pirs kirin. Mirovên ku di



Nêçîrvan Qilorî û Mahabad B. Qilorî

hîlbijartinan de digotin ew Kurdî dizanin her carî pir diguhêrt. Wisa xuya dike ku di bin tesîra sartên siyasî de van kesan Kurdbûna xwe vedişêrtin, yan jî, ji ber ku bijarkêran û hîlbijêran, ew tişt wek nişana girêdayina siyasî didîtin, digotin ku zimanê wana ya zikmakî Tirkî ye. Piştî sala 1965'a tewgera welatpareziya Kurdî, ya ku hêdî hêdî alaqaqek mezin distand, li Tirkîyê derket holê û bû sebaba serfiraziyeka nu ya nasnameya Kurdî. Di encama vê de li Tirkîyê pirtir kesan Kurdbûna xwe derxistin pêşiyê. Lê hêmarên statîstîkî hîn jî nînin, çima ku jiber ew tewgera Kurdî êdî pirsas nasnameyê divê nehatibûya kirin. Bi berçavgirtina bêstûkrariya hîlbijartinan, mirov dikare hêjmarê teqrîbîya axaftvanên Kurdî di hîlbijartinên giştî de, wek ji heyştan yek nişteçîhan bihesibîne. Di sala 1990 de divê ew 7 mîlyon bûya⁽¹⁾. Bi ihtimalek

mezin hêjmarê rasteqîn zêdetir e; heta Serokkomar Ozal di wê demê de digot ku hêjmarê Kurdan ji 12 mîlyon zedetir e.

Kurdî ne tenê li Tirkîyê lê li Îranê, Iraqê, Suriyê, Ermenistanê, Gurcistanê û Azerbeycanê jî (û bêguman bi zêdebûnekî ve li Ewrûpaya Rojava, Rusya, Amerîkaya Bakur û li Awistiralya ya ku tê de dîasporayek Kurdî ya pir biçalak heye) tê axaftin. Pir zaravayên Kurdî hene û ew di çar yan di pênc komên sereke de tên beş kirin: Kurmancî û Soranî awayên Bakûrî û başûriyên Kurdiya rasteqîn in. Lekî ya ku di başûrê-rojhilatê Soranî de tê axifin carna wek koma zaravaya seyemîn tê pejirandin. Ji bilî van hin du koma zaravayên ku kême grêdayî ne, di bakûr de Zazakî û di başûr de Gûraniyên ku li hîn herêman di nav Kurmancî û Soranî de li cih bûne, henin. Di nav hemû koma

zaravayên Kurdî de, axaftvanên Kurmanci -zaravaya vê ferhengê- herî zêde ne; li Tirkîyê, Sûriyê, bakûrê Kurdîstana Iraqê (Badînan), li heremên Îranê yên li ser sinorê Tirkîyê û li komarên Trans-Kafkasê (Gurcistan, Ermenistan û Azerbeycan) tê axaftin. Li Tirkîyê li cem Kurmancî Zazakî jî tê qise kirin -li gorî tehmînên xam ji sedî bîst yên Kurdan- lê pir Zaza hinek Kurmancî jî dizanin.

Tenê li Iraq û Ermenistanê statûyek Kurdî ya fermî heye û li wir demekî dirêj e ku bi Kurdî tê weşandin û li wan deran bi zimanê Kurdî perwerdeyî tê kirin û dîsa li wir televizyon û radyo bernameyên bi kurdî diweşînin. Zaravaya ku li Iraqê bi kar tê hema hema bes Soranî ye, ku ew zaravaya piraniya Kurdên Iraqê ye (ew zarava bi elfabeya erebiya adeptekirî ve te nivisandin). Hîn di sedsala 19şmîn de Soranî di qada edebî de ketibû merhaleyek geşbûnê; di çaryeka duwemin û ya seyemîn ya sadsala 20şan de rewşenbîran ji awayek Soranî zimanekî standart ya Kurdî çekirin⁽²⁾. Ji peyman aştî ya newbera tewgera Kurdî û desthilatdariya navendî ya adara 1970`ê vir ve Kurdî wek zimanê fermî yê duwemin ya welêt tê pejirandin û di herama Kurdan de heta bi zankoyê wek zimanê perwerdeyî tê bikaranîn.

Li Ermenistanê di dema stalînîzmê de li Kurdî zordarî hat kirin, lê ji salên 1960 vir ve jî ji hêla dewletê ve alîkarî lê hat kirin. Cara yekemîn li vir lipeyhev berhemên edebî hatin afirandin. Bandora van li ser Kurdên li dewarên din bi demekî dirêj marjînal ma: di dema Ôerê Sar de têkîlî dayîn pir mimkun nebû; di ser de li vir Kurdî bi alfabe ya Kirilî dihat nivisandin. Berbi dawîya salên 70`an li Tirkîyê hinek teksten Kurdî yên niviskarên ji Ermenistanê, ên ku li alfabe ya

Latînî hatibûn transkrîpte kirin, hatin weşandin⁽³⁾. Ew weşan ji dû weşandinê di demekî kin de hatibûn qedexa kirin. Danûstandinên cidî, ancax bi rêya komek rewşenbîrên Kurdên penaber, yên ku li salên heyştan li Swêdê bi cîh bûn, ve pêk hatin.

Ronasansa Çandî li Derweyî Welêt

Pêşveçûna Kurmancî, ya wek zimanê nivisandinê ya modern, karê rewşenbîrên derweyî welêt bû. Kovare yekemîna Kurdî Kurdîstan cara yekemîn di 1898şan de li Kahîrê û piştê li pey hev li Cenewrê, carekî dî li Kahîrê û li Londirê hat weşandin. Ew ji hêla endamên malbeta mîranî ya Bedîrxan, yên ku xwe weki dijberên Padîşah ên din li derweyî desthilatdariya wî cîh kiribûn, ve hat weşandin. Di navbera 1908 (gava ku Padîşah hêza xwe ya mitleq ji dû derbeyekî winda kiribû) û 1921`an (gava ku Tirkîyê ya nu ya Atatürk dest bi şiklîgirtina xwe dikir) de li Stembolê carcara derfetên weşandina kovaran hebû; ji dû vê demê weşandina bi Kurdî tenê li derweyî welêt minkun bû.

Qonaxek girîng kovara *Hawar* bû, ku di salên 30`an û 40`an de li Sûriyê ji hêla komek rewşenbîrên neteweperwer, yên ku ji Tirkîye ya Atatürk rewiya bûn, ve hatibû weşandin. Cara yekemîn elfabe ya Kurdî Latînî di vê kovarê de hat bikar anîn; ji bilî çend niqteyên piçûk mirov hîn îmlaya wê bikar tîne. Di morfolojî û di sintaksê de Kurdîya *Hawarê*, ku bîngeha wê devoka Cîzîrê û derdora wê bû, demekî dirêj wek zimanê standardê Kurmancî ma. Weşandina *Hawarê*, ji dû wê jî a ya kovarekî din, minkun bû cimkî Sûriyê wê demê di bin desthilatdariya Fransê de bû; ji dû serxwebûna Sûriyê êdî dawî li wan hat.

Ji pişt wê serkêşî ji hêla xwendawarên Kurdên ji Tirkîyê û ji yên Sûriyê ve li Ewrûpaya Rojava hat kirin. Komêk piçûk, ku ji xwe re Hevra digotin, di salên 60'an de koverek û çend pirtûkên bi Kurmancî weşandin. Di salên 70'an de komêk ji van xwendewanan, ku piraniya van çeparêz bûn, berê xwe dan karkerên ji Tirkîyê. KOMKAR (Komeleya Karkeran) a ku ji hêla van hatibû saz kirin, diceriband ku Kurdan li ser berjewendiyên wan ên bijarte organîze bike û bikaranîna Kurdî teşwîq bike. Bi vî awayî cara yekemîn Komkarê jibo mafê perwerdeyî ya Kurdî, wek zimanê zikmakî li şuna Tirkî, ket tewgerê (ku li dibistanan li Holandê û li Almanyê di çerçewa 'ziman û çand a xweş de dihat pêşkeşkirin). Vê saziyê hin pirtûk û bultenekî jî, ya ku li pey hev derdiket, diweşand. Di destpêkê de ew bi Tirkî û Almanî bû, lê ji salên 80şan vir ve jî herçî çû bi Kurdî derket.

Salên 80'an dema pêşketina nelibendebûyî ya Kurmancî bûn, pir îronîk e ku ew pêşketin li dû tadaya xurt ya li ser nasnameya Kurd li Tirkîyê derket holê. Femandarên leşkerê di sala 1980'ê de hikûmet ji kar xisti bû, ku yek ji armanca wan berîgirtina tewgera Kurdan bû, ku di dehsala çûyî de di nav xwendewanan û rewşenbîrên Kurdan de gêşbû bû. Gelek rewşenbîrên Kurd ji Tirkîyê rewiya bûn û ji dû gerek dirêj a li rojhilata navin, di dawiyê de li welatên wek Swêd û Almanyê bi cih û war bûn. Eger ew li Tirkîyê bimiyana, ewana belki ji ê bi Tirki binivîsiyana, lê jiber sebebên siyasî wana li sirgûniyê pêşanî dan zimanê Kurdî. Gelek kovarên Kurdi yên politîk û çandî û peyderpey pirtûk jî hatin weşandin; çîrokên gelerî, wergerên wêjaya Ewrûpî, dîwan û dû van kurteçîrok, meqale û romanên

bi Kurdi jî hatin weşandin. Babetên nujenên ku mirov heta demekî kin tenê bi Tirki li ser difikiriya û dipeywiya - Kurdi tenê di nav mal û gund de dihat bikar anîn- nika mirov fêrbû ku daxwaza xwe êdî bi Kurdî jî bibêje. Di va sala 2002 de Kurmancî êdî zimanê ku mirov pê dikare li ser hemû babetan bi awayekî fehmar û hûrgilî biaxife. Instîtûya Kurda Parîsê, ya ku di 1983 de ji hêla rewşenbîrên Kurdên sirgûniyê ve hatibû avakirin, forûmek hevdiîna niviskarên Kurd koordîne dike, ku ew standardîzekerina bêjeyên bo têgînên spesîfik ji xwere armanc digre. Ji Ewrûpayê bi rewşenbîr û niviskarên Kurdên Ermenistan (-a Sovyetê) re danûstandin danîn jî êsantir bû, ku li wir ji berê de lipeyhev berhemên wêjeyiyên Kurmancî çêbû bûn, ku ewana tesîrek bibar li ser Kurdên "Tirk" yên Ewrûpaya Rojava kir.


Ji dû jîholêrakirina qedexeya weşanên Kurdî di sala 1991 de ew geşbûna çandîya Kurmancî berê xwe da Tirkîyê jî, qet nebe berê xwe da bajarên mezinên li rojavaya Tirkîyê, ku li wir komêk girîng ya Kurdên perwerdebûyî dijiyan. (Ji ber ku di Kurdistanê bi xwe de rewşa awerte hebû û livînên çandî hema hema nemimkun bû). Pirtûkên ku cara yekem li Ewrûpayê çap bûbûn, li Tirkîyê carekî din hatin weşandin. Hinek weşanvanan kar û barên xwe ji Stockholmê birin Stembol û Ankarayê. Kesên ku li derweyî mala xwe jî Kurdî bikar aniyana li Tirkîyê jî zêde bû; bêje û metelokên ku di destpêkê de di nav komên piçûka rewşenbîran de çê bû bûn, peyderpey ketin nav çînanê frehên Kurmancîaxifan.

Ferhengên Kurdî

Di behsa Kurmancî de em karin bêjin ku ferheng ne tenê pêşdeçûna zimên û

serguzêsta axaftvanên Kurmancî nişan didin, lê wan, di beşa duwemîn a sed-sela bîstan de, di têkoşîna qabûlkirina çanda Kurdî de para xwe jî girtin. Ji ser ferhengên pêşîn gelek dem derbas bûye. Bi texmînî gerokê Tirkan Evliya Çelebî, di nîva sedsala 17'min de, kesê yekemîn bû ku lîsteyek peyivên Kurmancî amade kiri bû⁽⁴⁾. Ji dû sedsalekî zêdetir mîsyonerek Îtalyê ku demekî dirêj di Bakûrê-Irakê yê îroyîn de kar kiri bû, rêzimana yekemîna Kurdî, bi lîsteyek fireha Kurmanciya wê derê (yanê bi Badinî⁽⁵⁾), nivisî. Di saya mîsyoner û şandoxên ku çûne heremê de, herçiqas hinik be jî, hîn çend nivîs li ser zaravayên Kurdî ji mera mane. Kurdî jibo wan zimanek giring bû, jiber ku zimanê zikmakîyê komek ji Ermenî û Suryaniyên ortodoksên xiristiyanên heremê ne Ermenîkî û ne jî Suryanîkî lê Kurmancî bû. Manîdar e ku nivîsa yekemîn a Kurdiya çapkirî wergerek Încîlê bû, ku jibo Ermeniyên file yên Kurdistanê bû.

Ji bilî mîsyoneran eleqaya hinek balyoz û memurên Osmaniyan jî Kurdî anî bû ber çavan; jibo berjewendiya wan jî bû ku ewana danûstandin bi Kurdên niştecih û Kurdîaxifên heremê ve daynin. Alexandre Jabayê ku di dora nivê sedsala 19'mîn de balyozê Rusyayê Erziromê bû, ku ew li wir Kurmancî fêr bû bû û gelek destnivîsên Kurdiyên giranbiha berhev kiri bû, di sala 1879 de wî ferhenga yekemîna berfireha vî zimanî weşand, ku têda zêdeyî 10.000 bêje hebûn⁽⁶⁾. Berbi dawîya sedsala 19'mîn li Stembolê ferhenga bêkêmasiya Kurdî-Erebî ya Yusuf Ziyauddîn Paşa, yê ku memurekî nûjenîxwazê bi eslê xwe Filistinî bû û wî demekî dirêj li Bedlîsê walîti kiri bû, çap bû⁽⁷⁾. Ew du ferhengên ji xwe re devokên curbecur yên



Kurmancî bingeş girti bûn. Ew ferhengên li dû zêdeyî sadsalekî hîn qiymeta xwe wînda nekirin, jiber neteweperweriya Kurdî eleqeyak zanisti jî jibo Kurdî zede bû bû, û bi biryarekî di cih de ew careke din çap bûn.

Di nîva sedsala bîstan de ji hêla kurdoloxên Sovyetê ve çend ferhengên gelek berfireh, yên ku tu zarava ji xwe re bingeş negirtibûn, hatibûn weşiyân: Rusî-Kurdî ji hêla I.O. Farîzov ve û Kurdî-Rusî ji hêla Qanatê Kurdo (K. K. Kurdoev) ve. Di ew ferhengan de li gorî rêza jorîn 30.000 û 34.000 bêje hebûn, ku ji zaravayên cûrbecûr hatibûn berhev kirin⁽⁸⁾. Ferhengek gelek mutawazî ya Kurdî-Fransî-Îngîlîzî jî ji hela Joyce Blau ve, di bin çavdêriya Kamiran Bedîrxan de, hati bû amedekirin⁽⁹⁾. Ew ferheng demekî drêj jibo Ewrûpiyên Rojavayî wasiteya bikarbara yekta jibo Kurmanciya nujen bû. Zimên xwe ewqas bilez pêşdebiribû, ku ew ferheng bo xwandina nivîsên kovarên nujen êdî bikêr nedihat

Ferhengek Kurdî-Tirkî ya nadîde jî ya nivîskar rojnamevan Musa Anter e,

ku ew di sala 1967 de li Stembolê weşiya bû (10). Anter ev karê xwe -ji xwe ew listeyek dirêja bêjeyan bû- çend sal berê çapê, gava ku jiber karên xwe yên neteweperwerî di girtigehê de bû, amade kiri bû.

Di pêşgotinê de ew dinivîse ku wî bi vê ferhengê xwe ve xwastiye alîkariya rêzgirtina dualî di nav gelên Tirkîyê de bike. Bi rastî pêdivîtiya wî ya grîngtir, herhal ihtiyaca nîşandayîna zimanek serbixwebûyîna Kurdî bû, bi dewlemendiya gencîneya peyvên, û neku zaraveyek xwerabûyî ya Tirkî ye weke ku ideolojiya fermî dibêje. Di dehsala bê de ewê di hemû çalakîyên çandiyên Kurdî de wek pêdivîtiyek girîng bimîna. Ji ber ku desthilatdarên Tirk ji aliyekî ve tadayî li çanda Kurdî dikirin û ji aliyekî ve jî nedipêjêrandin ku tiştek weha wek zimanê Kurdî heye, jibo rewşenbîrên Kurdan girîng bû ku ew ispat bikin, ku zimanê Kurdî di rastiye de zimanek serbixwe, dewlemend e û ji Tirkî pir cûda ye, û bi alî bêjeyan ve jî dewlemend e û wêjeyek wê ya kevnar heye.

Wê wateyek zêde ya siyasî jî dida ferhengan. Ferhengên ku hebûn hatin wergerandin Tirkî, bi armanca lêbandorkirina reya giştî ya Tirkîyê hatin weşandin. Lîsteya bejeyan ya Joyce Blau ji hêla siyasetvanê Kurd Dr. Şivan (navê kod yê Sait Kırmızıtoprak) ve hat sererastkirin û ji dû mirina wî hat çap kirin û bidizî hat belav kirin⁽¹¹⁾. Demek kin ji dû vê wergera Tirkî ya ferhenga Yusuf Ziyauddin li Stembolê, û du vê jî ferhenga Rusî-Kurdî ya Farîzov weşiya⁽¹²⁾. Ji bilî di têkoşîna siyasî de wek çek bikaranîna van ferhengan, ji hela Kurdên ku bi Tirkî perwerde bûne, jibo dewlemendkirina gencîneya peyvên xwe û bikaranîna bêjeyên Kurdî 'pêtîş li şuna bêjeyên bi esl Tirkî jî ew pir hatin xebitandin.

